

**ARMANC**  
Xwedî: Yekîtiya  
Karkerê  
Demokratên  
Kurdistanê  
★  
Ji mehê carekê  
dertê  
Hejmar 73-74  
Hezîran-Tîrmeh 1987  
Buha: 10 Skr.  
2,5 DM

# Armanc

SERXWEBÛN • DEMOKRASİ • SOSYALİZM

Adress : Nordenflychtvägen 20, 112 51, Stockholm, Tel: 08 - 52 87 56 □ Adresa têkili û naman : P.O. BOX 240 12, 750 24 Uppsala / SWEDEN □ Postgiro : 50 37 99 - 9 □ ISSN 0348-7388

**ARMANC**  
Issue by  
The Demokratic  
Union of  
Kurdish Workers  
★  
Monthly Kurdish  
Magazine  
Nr. : 73-74  
June-July 1987  
Price: 10 SK.  
2,5 DM

SEROKÊ KONSEYA AŞTÎ YA DINÊ  
ROMESH CHANDRA:

## Ez bi we re me



Di 21-23'ye Nîsana çûyî de li Sofya; payîtexta Bulgarîstanê, konfransek aştî ya navnetewî li ser pirsa Kîbris bi navê "KIBRIS Ü AŞTÎ YA DINÊ" civiya, ku Serokê Kon-

Berêz Chandra, li çaralî dinê mirov te wek têkoşerekî aştiye ku her tim rûyê wî dibisire, wek têkoşerekî mafen mirovayî û edaletê dinasîn. Te tesirek wiha li ser gelê Kurd ê bindest jî hiştîye.

Lê rastiya tal a ku hê gelê Kurd li ser axa xwe negîhaştîye jiyanak azad û serbixwe û bi taybeti jî régirtina şovenîzma Tirk a navnetewî, nehiştîye ku em peywendiyêñ hîn nêziktir avabikin. Gelo ne wisa ye?

- Belê... Lî mesele DAY(Dewle-tên Amerika Yekbûyî) e û dîve baş di wê yekê bê gîhîstîn. Çunkî li piş Tirkîyê ew radiweste. Ji alî din jî mesele helbet ne bi Tirkîyê bi xwe re, lê bi hukumeta wê re ye.

- Wek tê zanîn, girêbenda li ber helkirina mesela Qîbris, wê işgalâ Tirkîyê ye ku Bakûrê Qîbris işgal kiriye û "dewlet"ek çêkîriye. Bi wê yekê re tê zanîn ku îşgal û êrîşen wiha, binpêkirina hiqûqa navnetewî, bêhîfîramiya ji biryaren NY(Netewêن Yekbûyî) re, ji

avabûna Cumhûriyeta Tirkîyê û vir de jê re bûye riye adestî. Înkarkirina gelê Kurd, red-kirina mafen wî yê millî û demokratîk, qetliamîn hov, jenosid, asimîlasyon û teror hemû nîşanên vê yekê ne. Li gor te, di vir de wazîfîn rîxistînen demokratîk ên navnetewî û a rastî wazîfîn Konseya Aştî ya Dinê ci ne?

- Em beşdarî hesten(hisîn) hemû kesîne ku daxwazîn heq bilind dîkin. Lî têkoşîn li ser milê wan Dûmahiik di rûpelê 7'an de

seya Aştî ya Dinê Romesh Chandra axaftina destpêk û kutasiya konfîransê kir. Li wir nûçegîhanê Armancê bi Romesh Chandra re li ser pirsa Kurdistanê hevpeyvînek çêkir:

Komelên Kurd û Tirk:

Radyo Dortmund bira weşanêñ xwe yên Kurdi bidomîne

Demek berî niha, li Almanya Federal li bajarê Dortmundê, radyoya herêmî ya bi navê "Radyo Dortmund Enternasional" dest bi weşanêñ Kurdi ji kiribû. Ev karê han gelekî li telê kevneperesten Tirk, konsolos û rojnamên burjuvazi yê Tirkîyê ketibû û ji bo rawestandina weşanêñ Kurdi zorê didan berpirsyarên radyoyê.

Li ser wê yekê komel û rîxistînen demokratîk ên Kurdi û Tirk ên li Almanya Federal, beyanek derxistin ku tê de dan xuyakirin ku li diji vê zordariya li hember weşanêñ Kurdi ne û daxwaza wan ew e ku radyo weşanêñ xwe yêñ Kurdi bidomîne. Komele û rîxistînen ku bi hev re beyan derxistin ev in: Av.Dev-Genç, Bîrlik Yolu, Devrîmcî İşçi, DîBAF, FîDEF,

M. Şêxmûs Cibrân:


Bijî têkoşîna serxwebûna gelê Kurd  
Bijî Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan

Mehkema leşkerî 14 sal ceza da M. Şêxmûs Cibrân û li ser protestokirina wî ya mehkemê ji nû ve dawek din lê vekir ku jê re 6 sal û 8 mehîn din ceza tê xwestin.

Li Mahkema Leşkerî ya Diyarbekirê, dawa di heqê M. Şêxmûs Cibrân de roja 14'ê hezîranê gîhîstîn dawîyê û hakîmên leşkerî, 14 sal cezayê hefsê dan. M. Şêxmûs Cibrân, ji ber ku endamê PPKK bû û ji bo xelasîya gelê Kurd têkoşîn dida. Bi eşkerekirina biryara mehkemê, M. Şêxmûs Cibrân biryar protesto kir û li ruyê hakiman de qîriya got: "Bîmre emperyalizm, faşîzm, kolonyalîzm û kevneperestî, bijî têkoşîna serxwebûna gelê Kurd, bijî Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan". Li ser vê protestoyê hakîmên mehkema diktatoriya faşist zedetir heç bûn û hemâ li wir, li salona mehkemê ji

bo vê protestoyê 6 sal û 8 mehîn din jî ceza jê re xwestin.

M. Şêxmûs salek berê jî derva bi dizî çubû hundurê welat lê di 9'ê Çîriya Paşî 1986'an de li Cizîrê hatîbû girtin. Pişti işkena meh û nîvîk zedetir, M. Şêxmûs Cibrân derxistin hemberî mehkema leşkerî û dawe di heqê wî de hat vekirin. Mehkemê, dixwest ku M. Şêxmûs poşmâniya xwe nişan bide û eşkere bike ku baweriya wî bi têkoşîna rizgarîxwaziya gelê Kurd nemaye. Lê M. Şêxmûs, ev yeka han bi mîrxasî ū şoreşgerî ya ji bo rizgariya gelê Kurd, di ruyê mehkemê de parast. Loma jî ev yek bû sedemê hîrsbûna heyeta mehkemê



û wê cezakî giran li M. Şêxmûs Cibrân birî.

Dr. İsmail Bêşîkçî ji zîndanê hat berdan

Dr. Beşîkçî: "Li Tirkîyê bi xelasbûna ji zîndanê nayê wê manê ku mirov gihiştîye azadiya xwe".

sal derbasbûne) 11 salên xwe di zîndanê de derbas kiriye.

Pişti ku ji zîndanê hat berdan, li ser pirseka rojnamevanê kovara Yenî Gundemê(kovareke hefteyî ya Tirk e) İsmail Beşîkçî wiha got:

"Li Tirkîyê, bi xelasbûna ji zîn-

Dûmahiik r.6



Seddamê xwînrêj cardin sêpî li dar xistin

8 welatparêzên Kurd

hatin bi dardekirin

Roja 12'ê Gulanê diktatoriya Seddamê xwînrêj 8 kesên welatparêz bi darde kirin. Sûcê wan: ji bo ku welatparêz bûn û têkîlyen wan bi tevgerên nîştimanî re hebûn. Kesên bidardekirî ev in:

- 1- Salah Abdullah; şofêr ji Wapuşkan
- 2- Reşîd Emin; şofêr ji Gozîne
- 3- Hecî Mam Ahmed; dikandar ji Sergolê
- 4- Ata Hemanî; şofêr ji Nahîya Şîrwan
- 5- Cemal Malûmo; şofêr ji Malîma
- 6- Cemal Mistefa; şofêr ji Sergolê
- 7- Husên Abdulla; şofêr ji Helanê

8- Hecî Şerif Hesen; dikandar ji Navlê

Roja 13.5.1987 li navça Helepçe gel li diji hêzên Seddam berxwedanek mezin nîşan da. Ev serîhildan fireh bû û heta Seyid Sadiq û Sirwanê çû. Balefrîn rejîma Seddam bombe barandin ser gel. Di vê êrişa hov de 70 kes şehîd ketin. Lî belê Sirwan hîn jî di destê pêşmergan de ye.

Roja 16'ê Gulanê li herêma Dihokê gelek kes tevî Partiya Demokrat a Kurdistana Iraqê bûn.

Li Erbentê pêşmergan gelek xenîmet bi dest xistin. Di nav vê xenîmetê de 4 tank jî hene.

Gerçek ADK, Goçmen, İşçi Gerçegî, KKDK, KOMKAR, KURD-KOM, Kurtuluş û TSK-DK. Komel û rîxistinê Kurdi û Tirk di beyana xwe de bi kurtî wiha gotin:

"Em lazim û pêwist dibînîn ku xwedî li doz û daxwaza gelê Kurd derkevin ku dawî li zîlm û zora ser Tirkîyê û Kurdistanê bê, mafen mili û demokratîk ên gelê Kurd bê naskirin, mafen wekhevî ji hemû kirêkarêni biyanî re bên dayîn ku li Almanya Federal in, ji bo kirêkarêni Kurd û ailênen wan mafen hîndekarî weşanêñ radyo û televîzyonê bi zimanê zîkmakî bên dayîn, û meqamên şewirdariya civakî bên avakirin û hebûna wan resmî bê nasîn ku ew jî mîletek in".

Em li ser helbest û hin mese-lênen edebiyata Kurdi bi helbest-vanê bi nav û deng ŞîRKO BÊKES re peyivîn

Nivîsa wê di hejmara bê de.

# Ji bona serperestiya Armancê a hêja

SORO

Jimarêñ Armancêñ 62 tanî 71, ên we ji bona min rîkiribûn, ew gîhaştin destêñ min. Ez we li ser rîkirina wan zor sipas dikim.

Min jimarêñ Armanca we hûr û kûr xwendin. Dûr û dirêj li wan nêrî û venerî. Pir min dêñ û bala xwe da şeweyê nîvîsandina wê, navroka wê û hêjî bêtir armancêñ wê. Ji ber vê yekê ez dixwazim ji bona xwendevanêñ we li ser van jimarana bîr û baweriya xwe bidim derxistin û xuyanîkî.

1- Derxistina vê rojnamê karekî pir bi nerxe û cihê hêjakirin û sipasiyê ye. Her rojnamek, yan ji kovareke Kurdi derdikeve, ew bi xwe mîxekî tâj û dirêjî ji bona tabûta faşistên Tirkîye, neviyên Cengîzzan, Holako, û Teymôrleng bi xwe ye. Pêşvexistina zimanê me û hêjî bêtir belavkirina bîr û baweriyan pêşverû di nava civaka me de, belê di nava Kurdistanâ me de, her û her xebata meyî siyasi geş û gurr dike, pêrejî goristana serdariya begane di nava welatê me de kûr dike, belê hêjî bêtir, gorîyan armanca me di serxwebûn û xweşbûna jînê de kêm dike û dema gîhandina wan armancan kurt dike. Ev rastiya han li ser me neçar dike ku em sev û roj vî zimanê şerîn bi pêşvexinîn berz û bala bikin, li bal gerdûn bi cih bikin, şoreşa zanyari di vê dema vejandina me de geş û gurr bikin; ji ber li ser bingehê vê şoreşa zanyari di nava civaka me de serxwebûn, xweşbûna jîna me û hêjî bêtir mirovaniya me têde tê diyarkirin û himkirin. Pêşvexistina zimanê me, geşkirina wêjeya me, şiyarkirina civaka me, tar û mar kirina konê sedsalen navîn ji nava Kurdistanâ me, ev karê perest, her û her li ser milêñ karker û cotkaren me ne. Begêñ me, axayêñ me, şex û melayêñ me û her weha jî burjuwaziyê meyî welatperwer, mîna ku serpêhatiya xebata me ji

me re diyar dike, nikaribûn ew û vî karê han rabin; jiber rola wanî mîjûyî di vê sedsala me de hatiye dawîkirin. Di vê sedsala bîstan de sermeyedarı ji bona sosyalistîyê li seraserî cihanê tête guhestin. Wehajê bi hinera pêşveçûna qanûnîn jînê, xebata me tête rîberkîrin di bin rîberiya karker û cotkaren me de li ser bingehê Marksizmê, Lenînizmê, belê bi komonîzmê her û her rîya xebata wan xweştir, rastir û berz û bala-tir dibû. Karêwan bi bertir dibûn û kîra wan li seraserî Kurdistanê qûl û kûr dibû, gewre û firehtir dibû, berz û balatir dibû. Weha em dizanîn kîlêta me li gel Sovyetê û Partiya Lenînî mezîn her di rîya van birayê me de tê danîn û hîm kirin. Ev dostanîya hanî girîng û mezîn ji destpêka Şoresa Oktobira Mezin de, di rîya Şex Mahmûd de hatiye danîn. Dostanîya Kurd û Sovyetê bingehê her pêşketinek meyî siyasi ye di vê sed-sala me de. Kevneperesten me, hevalbendê emperyalizmê û hes-tikojen bujuwaziyê me her û her milen xwe xuwar li ber kurtêlen kevneperesktiyê û dergehê emperyalizmê dikan. Belê ew hêviya çend kurtêla dikan, ku belkê kevneperest û emperyalizmîji wan re bavêje. Weha burjuwaziyê meyî gen û genî, hestikoj û li ser sifra dijimin me xwe firos, gava dostanîya Sovyet û Kurd berz û bala dibe dilê wê lihevdikeve, têxelandin û vedirse. Burjuwaziyê meyî genî xwe firos û hestikoj pêrejî dostanîya Sovyetê û partiya Lenînî mezîn li asûwê asmane Kurdistanâ me gurr dike, geş dibe û hêjî bêtir berz û bala dibe; jiber evaya serxwebûna me ye, xweşbûna jîna me ye û hêjî bêtir mirovaniya me bi xwe ye. Civaka me tête azad û rîzgarkirin, behrîşandina-mirov di rîya mirov de jî nava civaka me tête barkirin.

Armanca we, gava bi vî karê biçük radibe ji bona pêşvexistina vî zimanê meyî şerîn û her weha jî pêre ji dir û hovitiya dijmin di nava welatê me de tazî, rût û qût dike, cihê sipasyê ye, belê cihê dil-şadi û bextiyariyê ye. Bedbextiya me ji me re û her weha jî bir û baweriya cihanê re dûr yan nêzîk tê diyar kirin, belê li ser raman-

kirin, pirs kirin û bersiv kirin.

Li ser zaneyêñ me, dilsozen me, xebaşkarêñ me erk dike, ku ew ji dil û can ne bes tenê pişta we bigrin û vê çîrûska han bi birûsk kin, hêjî bêtir şev û roj di vî warî de kar bikin. Her yek li gora zanistiya xwe û karnasîna xwe di warêñ zanistiya civakî de û her weha ji di warêñ zanistiya serûfti de beş-darbibin.

2- Pir dilşad û bextiyar bûm bi belavkirina we nivîstoka Karlanê Çaçanî, di bin navê û nîşana "Pî-mamtiya Cimata Ermeniya û Kur-dan". Belê guhdan bi vê pîrsa han kareki pir girîng û hêjî bêtir pêwistike meyî şerîyî li ser me. Berzkarina ala dostanîyê û biratiyê li gel Ermeniya tevaya dilsoziya me, zanebûna me û hêjî bêtir têgîhiştina me ji bona mîjûwa me û ayinda me diyar dike. Ev rûpe-lén ges û xweş divîn her û her li wan bêtin gerandin, venerandin, lîkolandin, derxistin û geşkirin di nava civaka me de. Her û her durujmê dostanîyê, hevaletiyê û biratiyê di nava me û civaka Ermeniya de bête berz û bala kirin. Em û wan bi hezaran sal bi xêr û xweşî li gel hev hemşane, belê li gel hev jîyane. Derd û birînê me, dûr yan nêzîk her dû mîna hev in. Dijminen meyî dir û hov mîna hev in, yek in. Belê Mîjûwa me ji bona me bi diyar rastiya vê dostanîyê û hêjî bêtir girîngbûn û pêwistîya wê di ayinda me de, bi xwe diyar dike. Li ser vê dostanîyê û bi saya xebata hejar û perîşanêñ Kurd xebata me bi serketinê mujde(miz-gîn) dike. Ji dawîya sedsalen noz-dehan de hetanî neha, hemû liberxwedanen me, serhîdanen me, raperînen me û şoreşen me, her weha jî hemû civatîn me, saz-mendiyen me, rîxistin en me û partiyen me dûr yan nêzîk her û her pêwendî li gel Ermeniya kirine û gerandine. Her û her Ermeniya ji li gora dem û karîna xwe ji bona alîkariya xebata me kîmtir xemî nekirine. Dilsozen me, zaneyen me, rîberen me her û her xebat kirine ji bona vê dostanîyê û xurt-kirina we. Weha jî deha jî mîjûwa meyî nehaşî vê rastiya han ji me re di nava rûpelén xwe de dîpoşîne. Têgîhiştina mîjûwa me, liber-keftina ayinda me, agahdarîya me li ser rewş û zinata Kurdistanâ me û hêjî bêtir li ser dijwariya çareki-rina pîrsyariya Kurd bi xwe û kér-kirina hêz û hîneren zalbûyî di vê dema me de, li ser me neçar dike, dilsoziya me, dostanîya me, heval-tya me û biratiyâ me li gel Ermeniya. Her wehajî perwerdekerîna keç û lawen Kurdistanâ bi vê dostanîyê û her û her liberxustin û têgîhiştina wan, ku çarenûsa Kurd, belê careke din pêkhatina dewleteke Kurdî serbixwe di vê sedsala me de rîya Ermenîstanê re û di ser Ermenîstanê re tête kirin û derbaskirin. Neqşî Rojhilata Navîn bi carekê ve tête guhertin. Sînorîn kîşandî ji salen 1514 û vir de, tanî neha, di nava Kurdistanâ me de têne, tar û mar kirin. Kurdistanâ me dibe Vietnam'a Rojhilata Navîn, hêviya gelê Kurd, Ereb, Tirk û ên Iranî bi xwe. Gelo ji bona Kurdish ji vê xewna neha, belê rastiya sibehê mezintir heye? Dema tê gotin; em bê kes û kûsin ji nava civaka me, belê ji nava Kurdistanâ me tête hilanîn; jiber em xwe bi xwe nas-dikin û hêjî bêtir em dost û dijmi-nen xwe ji hev cuda dikan.

Karên min tanî niha wergerdinâ zaravayê Kurmançî û hatine belavkirin ev in:

- 1- Manifesta Partiya Komunist, Marks, Engels, sala 1976 de.
- 2- Pêşketina Sosyalistîyê û Otopî Tanî Zanistiyê, Engels, sala 1977 de.
- 3- Sê Kanî û Sê Pêkhatînên Marksistîyê, Lenîn, sala 1977 de.
- 4- Cihê Rola Kar di Pêşvexistina Meymîn jibona Mirov, Engels
- Karên hatine wergerdinâ, lê hêjî nehatine çapkirin, ev in:
- 1- Derbarê Çarenûsa Netewan, Lenîn
- 2- Gotara Lenîn li ser Dewletê
- 3- Dewlet û Şûresê, Lenîn(wer-gerdinâ vê pirtûkê niha destê min da ye).

Karên min:

- 1- Li Ser Tirba Şêro, sala 1966 hatiye belavkirin.
- 2- Sî sal Mîjûwa Xwendekarêñ Kurd li Ewrûpa, sala 1986 de.
- 3- Gundê me, hêjî nehtiye belavkirin.
- 4- Guhpêdana we bi birayen meyî li Sovyetê nemaze xebata wan ji bona pêşvexistina zimên, wêjî û mîjûwa me ji bal wan ve, cihê sipasyê ye. Zaneyen Kurd li

Sovyetê bi saya sîstema sosyalisti-

yê û çarekirina Lenînî ji bona pîrs-yariya mili, wehaji Kurdêñ komo-nîst destêñ xwe vemalandin û şev

û roj şiyarkirin û pêşvexistina civa-ka Kurdi biçük li Sovyetê xebat û kar kirin, keftileft û têkoşînkirin.

Karêwan piirr dijwar bû, sengin û giran bû. Lî baweriya wanî xurt

bi Marksizmê, Lenînizmê, belê bi komonîzmê her û her rîya xebata

wan xweştir, rastir û berz û bala-

tir dibû. Karêwan bi bertir dibûn

û kîra wan li seraserî Kurdistanê qûl û kûr dibû, gewre û firehtir

dibû, berz û balatir dibû. Weha

em dizanîn kîlêta me li gel Sovyetê û Partiya Lenînî mezîn her di

rîya van birayê me de tê danîn û hîm kirin. Ev dostanîya hanî

girîng û mezîn ji destpêka Şoresa

Oktobira Mezin de, di rîya Şex

Mahmûd de hatiye danîn. Dosta-

nîya Kurd û Sovyetê bingehê her

pêşketinek meyî siyasi ye di vê sed-

sala me de. Kevneperesten me, hevalbendê emperyalizmê û hes-

titikojen bujuwaziyê me her û her

milîn xwe xuwar li ber kurtêlen

kevneperesktiyê û dergehê emperyalizmê dikan. Belê ew hêviya

çend kurtêla dikan, ku belkê kevneperest û emperyalizmîji wan re

bavêje. Weha burjuwaziyê meyî gen û genî, hestikoj û li ser

sifra dijimin me xwe firos, gava

dostanîya Sovyet û Kurd berz û

bala dibe dilê wê lihevdikeve, têxe-

landin û vedirse. Burjuwaziyê meyî genî xwe firos û hestikoj

pêrejî dagirkirin Kurdistanê, gava

navê Marksî, Lenîn û dostanîya

Sovyetê li nava Kurdistanê tête

bihîstîn û berzkarîn dilen wan bi

hev re tête lerizandin. Taya mirînê digre ser çavêwan wan. Tev li vêjî

bir û baweriya Marksizmê, Lenînizmê, belê komonîzmê û pêrejî

dostanîya Sovyetê û partiya

Lenînî mezîn li asûwê asmane

Kurdistanâ me gurr dike, geş dibe

û hêjî bêtir berz û bala dibe; jiber

evaya serxwebûna me ye, xweşbûna

jîna me ye û hêjî bêtir mirovaniya

me bi xwe ye. Civaka me tête

azad û rîzgarkirin, behrîşandina-

mirov di rîya mirov de jî nava civaka

me tête barkirin.

4- Ji bona wan armancêñ jorî, ez dixwazim rojnama we bi çend

karêñ biçük bixemilînim, bidim

xelat kirin, belkî di nava rûpelén

vê rojnamê de hûn bikarîn ji wan

sûd û kelk bi belavkirina wan wer-

bigrin.

Karên min tanî niha wergerdinâ

zaravayê Kurmançî û hatine

belavkirin ev in:

1- Manifesta Partiya Komunist, Marks, Engels, sala 1976 de.

2- Pêşketina Sosyalistîyê û Oto-pî Tanî Zanistiyê, Engels, sala 1977 de.

3- Sê Kanî û Sê Pêkhatînên Marksistîyê, Lenîn, sala 1977 de.

4- Cihê Rola Kar di Pêşvexistina

Meymîn jibona Mirov, Engels

Karên hatine wergerdinâ, lê hêjî

nehatine çapkirin, ev in:

1- Derbarê Çarenûsa Netewan, Lenîn

2- Gotara Lenîn li ser Dewletê

3- Dewlet û Şûresê, Lenîn(wer-

gerdinâ vê pirtûkê niha destê

min da ye).

Karên min:

1- Li Ser Tirba Şêro, sala 1966

hatiye belavkirin.

2- Sî sal Mîjûwa Xwendekarêñ

Kurd li Ewrûpa, sala 1986 de.

3- Gundê me, hêjî nehtiye

belavkirin.

Weha ez dixwazim vê nameya

xwe ji xwendevanêñ Armancê re

bînim dawîkirin, bi hêviya careke



# Bila mîslêni li Ewrûpa ji holê rabin

Di navbera 27-29'ê Hezîranê de endamên Peymana Warşovayê li payitexta Komara Almanya Demokratik (DDR), Berlinê civîyan. Di rojeva civinî de ji bo pêkanîna aştiyê û çekdaxistinê hin biryar hetin stendin. Ji van bîryaran ya herî girîng, ji holê rakirina mîslêni bi bomba atom barkirî li Ewrûpa û çekên klasik li hemû dinî ye.

Di beyana ku di dawiya civinê de hate pêşkêskirin, Peymana Warşovayê daxwaza xwe ya kêmkirina fuzeyên nîmînîl ên li besê Asyayê yên YS'ê û yên li DAY'ê carek din anî holê. Pêşniyara di pênc salan de %50 kêmkirina çekên stratejik û qedexekirina ceribandina bomben atomî her wek xwe ye.


Peymana Warşovayê rojek zûtir dixwaze peymanekê li ser qedexekirina çekên kimyewi bête çekirin. Di beyanê de tê gotin ku Peymana Warşovayê amadeye ji bo jî ısal ve destpêkirina ji holê rakirina fabrikayê çekên kimyewi û çekên kimyewi ku hatine depokirinê.

Wek tê zanîn di destpêka sala 1987'an de Yekîtiya Sovyeti çekiçîna çeken kimyewi rawestandibû.

Peymana Warşovayê salik berê pêşniyara peymana %25 kêmkirina hêzên klasik ên li Ewrûpa pêş-

kêş kiribû. Lî belê NATO qet guh nade vê pêşniyare. Fransa, Almanya Federal û Britanya hêzên xwe yên klasik bi hêzir kirin û hejmâ-

leşkerî li her du aliyan Ewrûpa ne tişteki normal e û daxwaz tê kirin ku hem Pakta Warşovayê û hem jî Nato bêtin belakirinê.



ra leşkerên van hêzan zêdetir kirin.

Peymana Warşovayê di beyana xwe de piştgiriya daxwaza afirandinê herêmîn ji bomben atomî azadkîrî wek li Îskandînayyê û li Balkanê dê ji bo aştiyê rolek gîring bileyize.

Peymana Warşovayê carek din beyan dike ku ci dibe bila bibe erîşê welatan nake û armanca paktê xwe parastin e. Hebûna du blokên

Beyana Pakta Warşovayê ji bo gotübêja doktrinê PW û NATO'ye pêşniyar dike ku ji her du aliyan komîte bêtin dameziran din û bila van komîtana hev ziynet bikin. Di van ziyyaretan de xebat bête kirin ku "şik û bê baweriyê salan" ji holê rabe û bi vi awayî ji hev famkirin bila hêsan-tir bibe.

•

## Dr. H. Hemdan hat kuştin

Endamê Komîta Merkezi ya Partiya Komînist a Lubnan Mehdî Amil roja 18.5.1987'an ji alî sê kesan ve hat kuştin.

Hesen Hemdan li Unîwersîta Lubnanê doktorê felsefî bû. Nêzi-


kî 10 pirtükên wî hatine weşandin. Bêî van du pirtükên wî yên helbestan jî hene.

H. Hemdan afirandinê xwe bi navê Mehdî Amil weşandine. Ew di sala 1936'an de li Beyrûde hati-

bû dinê. Zewicî û bavê sê zarakan bû. H. Hemdan ji sala 1960'î virde endamê Partiya Komînist a Lubnanê bû. Di sala 1987'an, di Kongra 5'an de ji endametiya Komîta Merkezi re hat hilbijartîn.

Li ser kustina H. Hemdan Komîta Merkezi ya Partiya Komînist a Lubnan belavokek belav kir. Di vê belavokê de tê gotin ku H. Hemdan bi destê tacîrîn din hatiye kuştin. Wek tê zanîn berî viya bi demekê endamê Komîta Merkezi ya PKL Husen Merwo jî li mala xwe ji ali EMEL ve hatibû kuştin.

Cardin, ji bo protestokirina kuştina H. Hemdan boykot çêbû. Partiya Komînist a Lubnanê, Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan (PPKK), Partiya Komînist ya Urdun, Cepha Gel a Bahrê, Cepha Rizgariya Netewî ya Bahrê, Partiya Keda Komînist a Tirkîyê, Partiya Komînist ya Misrê, Partiya Komînist ya Iraqê, Cepha Rizgariya Gelê Filistin-Rêxistina Urdunê, Cepha Demokratik a Gelê Filistin-Rêxistina Urdunê, Cepha Rizgariya Gelê Umman, Partiya Sosyalist ya Iraqê, Yekîtiya Demokratîn Iraq, Partiya Demokratik a Gelê Kurdistan, Partiya Komînist a Suudî Arabistan û Yekîtiya Welatparêzen Misri li Derveyî Welat di mitîngê de bi hev re belavokek ku ev qetliama mahkûm dikir, belav kirin.



## DI HEFTEKÊ DE 280.000 ZAROK DIMRIN

Li gor rapora salane ya UNICEF'ê di heftekê de 280.000 zarok dimrin. İro li welatên paşdemayî tenê %40'ê zarakan li dij nexwesînîn dîrmî (gerok) hatine aşikirînê (vaccination).

UNICEF heyâ niha ji 100 welatên paşdemayî re 377 milyon vacîn (dermanê aşiyê) şandiye û armanc ew e ku heyâ sala 1990 hemû zarokên dinê bêñ aşı kirinê.

Di rapora UNICEF'ê de tê

gotin ku di piraniya welatên paşdemayî de gavîn girîng hatine avêtin. Li Tirkîyê bi tamkirinê 22.000 zarok ji mirinê xilas dibin. Li Cezayirê hejmara mirina zarakan %50 kêm bûye. Li Colombia 4 milyon û li Perûyê ji 600.000 zarok hatine aşikirin. Li Komara Dominikê nêzî 20.000 kes ji bo ku li ser nexweşinê wek virîkî û malariya informasyon bidin jîna, hatiye gîhandin.. Lista van wela-

tan pirr dirêj e. Lî reqemên berçav de serkeftina xebata UNICEF'ê isbat dike.

Li gor rapora UNICEF'ê, welatên pêşdeçûyi dikarin alîkariya zarokên welatên feqîr bikin. Eger welatên pêşdeçûyi imkanen xwe ji bo UNICEF'ê pêşkêş bikin wê UNICEF bikaribe salê 7 milyon zarok ji mirinê xilas bike.

•••

## Nêrîna gelê Ewrûpî ya li ser Sovyetê tê guhertin

Di navbera 24'ê adarê û 30'ye Gulanî li neh welatên Ewrûpî - Swêd, Yewnanîstan, Fransa, Belçika, Almanya Federal, İtalya, Hollanda, Britanya û Swîsre lêkolîneke istatistikî li ser daxwaziya aştiyê hate çekirin. Dawiya vê lêkolîneeskere bû ku gelê Ewrûpâ bi piranî ji dilxwaziya siyaseta aştiyâ Gorbaçov û Yekîtiya Sovyeti bawer dikin.

Lêkolîn tişteki din jî eşkere dike. Ew jî guhertina nêrîna gelên Ewrûpî li ser Yekîtiya Sovyet e.

Jî 6064 kesen Ewrûpî pîrsa "Gelo li gor nêrîna te nêrîna li ser Sovyetê di van demêni dawî de baştir bûye yan jî xirabtir bûye, yan jî nehate guhertin?" hat pîrsin. Sedi 63'ê bersivan "baştir bûye" dan.

Ev reqem li Hollandayê %80, li İtalyayê %73 û li Swêd jî %65 bû.

Lêkolîn bi xwe pir pîrsen entre-san anîye holê lê em ji wan tenê duduyan li jîr pêşkêş dikin.

Pîrs: Li gor bawerîya te tişte ku mîrov li ser Sovyetê dînivîse û dîbihîze gelo bi piranî erê-nî (tişte baş), tişte xwes, yan jî bi piranî tişte ne baş e? Yan jî tişte baş û tişte ne baş wekhev in?

Bersiv:

Tişte baş Wekhev Tişte ne baş

|                 |     |     |
|-----------------|-----|-----|
| Swêd %12        | %33 | %51 |
| Belçika %17     | %39 | %28 |
| Fransa %11      | %32 | %34 |
| Yewnanîstan %43 | %37 | %8  |

Hollanda %17 %58 %16  
İtalya %16 %53 %26  
Swîsre %23 %29 %38  
Britanya %9 %51 %29  
Almanya F. %42 %45 %12

Pîrs: Gelo li gor bawerîya te ji DAY û Sovyet kî pîrtir dixwaze çek daxîne, yan herdu jî çekdaxistinê dixwazin?

Bersiv:

Sovyet Herdu jî DAY

|                 |     |     |
|-----------------|-----|-----|
| Swêd %28        | %56 | %7  |
| Belçika %28     | %30 | %13 |
| Fransa %17      | %53 | %17 |
| Yewnanîstan %58 | %20 | %4  |
| Hollanda %47    | %35 | %9  |
| İtalya %31      | %58 | %8  |
| Swîsre %30      | %46 | %12 |
| Britanya %38    | %34 | %13 |
| Almanya F. %28  | %58 | %13 |

## Zêdebûna nifûsê dahatûyê dixe xeterê

Bi bûna zarokekî di nîv sala 1987'an de dê nifûsa dinê bigihije 5 milyarı. Kes nizane ev zaroke ha wê kengî û li ku derê were dinê. Lê belê Fonda Nifûsê ya Netewen Yekbûyi (UNFPA) 11'yê Temûzê "Roja-Pênc Milyarı" ilan kir. Li gor rapora salane, nifûsa dinê sala

2000'î wê bigihije nêzî 10 milyarı.

Nuha nifûsa dinê de deqîqekê de 150 kes zêde dibe. Bi gotineke din zêdebûna nifûsa dinê di rojê de 220.000 û di salê de jî 80 milyon e.

Li gor rapora salane ya UNFPA, mirina zarokan jî kêm bûye. İro jî 1000 zarokan 80 zarok dimrin.

Ku mîrov hejmara zarokên mirî yedsala 16'an bîne ber çav, ev neticeya ha serkeftinek mezin e. Li gor raporî de dirêjahiya emrî mîrova de jî serkeftinek heye. Dirêjahiya emrî mîrovan iro li dor 60'î ye Ev reqem 300 sal berê li dor 20 bû.

## CIVÎN BI MAMOSTE Û HÎNDEKARÊN UNÎVERSÎTÊ RE Çerçewa Hîndekariyê Kî Tesbît Dike

Sekreteriya Giştî ya Komîta Ewlekariya Netewî û Midûriya Giştî ya Emniyît bi mamoste û hîndekarên Unîversîta İstenbolê re cîvînek pîkanîn. Civîn bi axaftina Rektörê Unîversitye Cemî Demiroglu vebû:

"Ev civîn di dîroka cumhuriyete de ne civîna cara yekemîn e ku hatiye tertipkirin. Civînek weha ma di sala 1985'în de bi kesen ku bi karên idarî re berpirsyar bûn çekir. Ji ber ku me feyde ji wê civînî dît, vê carê me xwest hemû hîndekar beşdar bibin... Ev, civîn ne konferans e, civînek agahdariyeye".

Pîstî rektör generalekî rutbebilind rabû axift; "Welaşen ku em

cîrânin, her yek ji wan hesabekî wan li ser Tirkîyê heye. Ji bo bigihijin armancen xwe rîxistinê "cûdaxwaz" û "xirabkar" bi kartînin.

General di nav axaftina xwe da got Rusya ji bo bigihije armancen xwe de sehak teng de gelek leşker civandîye. Ew li kéléka Bulgaristan hebûna Tirkîyek bi quwet naxwazin. Yunanîstan jî dixwaze rojavayê Tirkîyê heta Antalya û herêma Trabzonê têxe nav erden xwe. Surye bi rîxistinê "cûdaxwaz" re him maddî û him jî mane-wi alîkariyê dike û daxwaza wan a ku Hatayê bidestxin hîn jî heye. Rîxistinê "cûdaxwaz" jî dixwazin li ser herêmen "Rojhilatê Ana-

dolê" û "Başûrê Rojhilatê Andolê" dewletêk avabikin. Pîstî generalê rutbebilind, yel sîvîl rabû axift. Wî yek bi yek ser rîxistinê cep û "cûdaxwaz sekîn û agahdariyek bi teferuat derheq faaliyetê wan da da. Berwedenê xwendevana en 1968'a berxwendana karkeran a 15 û 16 Hezîranê ya çîna karker wek sed mîn hîmî en anarşîya ku heta û dom dike nîşan da.

Bi vê civîna "agahdari" yê carek din hate xwiyakirin ku çêwa hîndekariyê ne universite, di dervayê universite tê test kirin.

## Gelên dewletên Balkan karîn halê gelê Kurd û têkoşîna wî bastir fambilîn

Di 6.6.1987 de bajarê Hannover cejna xortên gelên nava dewletâ Yugoslav ji alê Makedonîyan ve bi festivalê folklori hate pîroz-kirin. Folklor grûpén Alman û bi navê Kurdan a KKDK (Federasyona Komelîn Demokratîn Kurdistan li Almanya Federal) hatibûn vexwendin.

Nêzî 700 kes di festivalê e beşdar bûn. Piraniya wan ji Yougoslavîya bûn.

Programê festivalê zahf dewlemdîn bû. Deh grûbîn folklorâ Makedonî tevi festivalê bûn. Wan gelek reks û govendîn curecur pêşkêş mîvanan kirin. Grûpa folklorâ KKDK a bajare Celle çend reqsem delal ji Kurdistanê liber dilok û tembûra dengbêj G. Ronak pêş-

mîvanan kir. Reqsem Kurda û reqsan baş hatin dîtin û loma jî ew hatin xelatkirin.

Bi navê KKDK di festivalê de xeberdanek hatkirin, ku ji komîta amadekirina şevê re sipasi da xwiyakirin. Şorevanê KKDK'ê, di xeberdâna xwe de li ser zulma her çar dewletên mîtingehkar, ku li gelê Kurd dikin û li ser têkoşîna gelê Kurd a ji bo serxwebûn û azadiy sekîn. Wî got: "Gelê Kurd ji bo dewleteke serbixwe û demokratît têkoşîn dide".

"Em bawer dikin ku gelên dewletên Balkan - Yunan, Bulgar û gelên ji dewleta Yugoslav - baştir karîn halê me, têkoşîna me fêm bikin. Ji ber ku hun gelên ji Yugoslavya ji bi sed salan di bin

•••

"Li Almanya Federal ji sê hezâri bêtir Kurd dijîn. Tu man yê wekî biyaniyê din nî Ne mafê televizyonê û ne jî yê r yoyê bi Kurdi. Em van heqan ji Kurdan jî dixwazin, divê, ku za kîn Kurda jî wekî yê biyaniyê din karibin di dibistanan de zin nê Kurdi, diroka xwe û kultî xwe bixwinin".

•••

# Mela Xelîlê Sêrtî (1756-1841)

Mahmûd LEWENDÎ

Mela Xelîlê Sêrtî yek ji alimên mezintirinê Kurdistanê ye. Nav ú dengê wî ne tenê li Kurdistanê; her weha li nav Osmaniyen(Tirk), Ereb û Farisan ji belav bûbû. Wî ji wek alimên hevdemê xwe li ber destê mela ú li medresyan xwendibû. Mela Xelîlê Sêrtî jîbil zimanê xwe yê zikmakî Kurdî, her weha bi Farisî, Tirkî(Osmanî) û Erebî ji dizanibû ú bi van her çar zimanân kitêb ji nivisine.

Mela Xelîl sala 1756'an(1) li hêla Sêrtê(Sürt) li Hêzanê hatiye dinê. Navê bavê wî Mela Hesen e. Derheqê jiyanâ Mela Xelîlê Sêrtî di Bûrsali Mehmet Tâhir Efendi di kitêba xwe ya "Osmanî Muelliflerî" de weha nivisine:

"... Alimê Kurdistanê Mela Xelîl Sêrtî tâhsîla xwe ya seretayî li ber destê bavê xwe Mela Hesen dixwîne, pişt rî li ber destê Ibrahim Heqqî Efendi(2) xwendîna xwe didomîne ú ew di ilm de digihî derecaya herî bilind.... Mela Xelîl pişt temamîkirina tâhsîla xwe vedigere Sêrtê. Li wê derê ji bo belavkirina ilm à irfanê xizmetê dike, kîteban dînîvise..... Mela Xelîl Sêrtî di 1841'an(3) de li Sêrtî dike ser heqîya xwe...."(4)

Mela Xelîl Sêrtî nêzi 30 kitêb nivisine ku ji wan 4 kitêb bi Kurdi ne. Kitêbên wî yêni bi Kurdi ev in:

1- Nehc ul-Enam (Bi awayê helbestî hatiye nivisîn, wek Eqîda Îmanê ya Ehmedê Xanî ye)

2- Tecwîd (Ev ji bi awayê helbestî hatiye nivisîn)

3- Zrûf (Ev ji li ser nehw, zerfî mekan uzerfî zeman e, 20 rûpel e)

4- Kitabu't-terkîb (Ev ji bi awayê pexşan/nesir/ hatiye nivisîn) (5)

Ebdulreqîb Yûsif di kitêba xwe ya "Dîwanâ Kurmancî" de nivisiye ku kitêbeke din a bi Kurmancî ya Mela Xelîl heye ku li ser maniq nivisiye. Ev kitêba wî di nav feqîyen Kurdistanê de wek derskê tâ xwendîn.(6) Navê vê kitêbê Îsaxoju ye. Eslê wê Grêki ye. Di dema kevnare de ji Grêki hatiye wergerandin zîmanê Erebî. Mela Xelîl Sêrtî ji ew wergerandiye Kurdi. Kitêb di nav Kurdan de bi navê "Îsaxoju" ya Mela Xelîl Sêrtî tê nasin.

## BERHEMÊN MELA XELÎL:(7)

1- Tefsîru Tabsîretu'l-Qulubî fi'l-Kelamî Ella-mî'l-Xuyûb.

2- Tefsîru Axîrî ila Sûretî'l-Kehf

3- Zîyau Qelbî'l-Arifî fit-tecwîdi we'r-resmi we ferseyi'l-hurûf(menzûm).

4- Şerhû 'ela menzûmeti'ş-satîbi fi't-tecwîd.

5- Mahsûlu'l-mewahîbî'l-chadiyyeti' fi'l-hesaisi we'ş-semailî'l-Ehmediye.

6- Tesîsu qewaidi'l-eqađî 'ela ma sehma min ehli'z-zahirî we'l-batinî min'e'l-ewâ'id.

- 7- Mulahhasu'l-qewetî we'z-zewacir.
- 8- Kitabun fi usûl'i'l-fiqhi'ş-safî.
- 9- Kitabun fi usûl'i'l-hedîs.
- 10- Zubdetu ma fi fetaw'e'l-hedîs.
- 11- Muxteser şerhi's-sudûri fi şerhi'l-mewti we ehwâl'i'l-kubûr.
- 12- Minhâl'u's-sunneti fi edabî sulukî's-sufiyeti(menzûm).
- 13- Nebzetun mine'l-medeniyyeti fi'ş-sethiyyeti we'l-wahdeti'z-zatîfe.
- 14- Nehc'u'l-enamî fi'l-eqâid(menzûm).
- 15- Kitabu'l-eqâidî bi'l-luxate'l-Kurdîyye(menzûm).
- 16- Şerhû 'ela qesîdeti'l-hemziyye.
- 17- Risaleyi' zexire fil me'fuwwet.
- 18- Ezharu'l-xusunî mîn mekulatî erbâbi'l-funûn.
- 19- El-Qamûsu's-sanîfin-nehwî we's-serfi we'l-me'anî.
- 20- Risale fi ilmî'l-mentiq.
- 21- Risale fi'l-mecâzi we'l-îstîfare.
- 22- Risale fi ilmî edebî'l-behsî we'l-munazere(menzûm).
- 23- Rîsâle fi'l-wazî'i.
- 24- El-Mentiqu'z-zumrudîyye nezmu telhîsil-miftîh.
- 25- Menzûme fi mevlîdin-nebiyyî.

Nehc'u'l-Enam'a Mela Xelîl Sêrtî ku di nav Kurda de ya heri baş tê naskirin ew e, heta nuha bi qasî ku em pê dizanîn 3 caran hatiye çapkirin.

I- Cara pêşin, di 1919'an de li Istenbolê hatiye çapkirin. Welê diyar e ku ji ali karbidesten kovara "Kurdistan" hatiye çap kirin. Ji ber ku li ser bergê dawî ya hejmara 3. û 6. (1919) a kovara Kurdistanê de hatiye nivisîn ku; "ev kitêbên Kurdi li idarexana kovara Kurdistanê peyda dibin:

1- Eqîda Mela Xelîl Siîrdi (menzûm ilmîhal û ilmî ehlaq)

2- Eqîda Mela Ehmedê Xanî (menzûm ilmîhal).

3- Eqîda Kurdan- Ebdurrehîm Efendi (menzûm ilmîhal).

4- Muqeddimetu'l-Irfan- M(umemed) M(ihrî), (broşurek e ku xizmeta yekîtiya zimanê Kurdi dike.) (8)

II- Cara duwem, di 1337(1921)'an de ji ali kesekî ku navê wî Mistefa Helim e, hatiye nivisîn û di nav Weşanê Weqfi İslâmî û Eskeri de li Tirkîye hatiye çapkirin.(9)

III- Cara sêyem ji di 1357(1941)'an de ji ali Mihemed Remezan li gel Eqîda Îmanê ya Ehmedê Xanî, li Şamê hatiye çap kirin.

Li derveyî yê çapkirî, her weha gelek dest-nivisîn Nehc'u'l-Enamê ji hene.

Nehc'u'l-Enam a Mela Xelîl ji Eqîda Îmanê

ya Ehmedê Xanî dirêjtir e. Naveroka wê behsa şertîn îmanê û awayê edebê dike ku ji 21 helbestan pêk hatiye.

Helbesta pêşin behsa ferzîn 'eyn dike, jê çend rîz ev in:

*"Tu guh dêre nutq ú beyanafestih  
Ji bo te ferzé 'eyna ne merdi melih  
Ku iman û İslâm ú sewm ú selat  
Li ser malîdaran e hec ú zekat  
....."*

Di dawiya vê helbestê de ku êdî qala Xwedê dike û weha bi dawî tîne:

*"Ji nefsa te nézikirinî te ye  
Xebîrê bi ef'al ú qewlê te ye"(r:2, 3)*

Di helbesta duemîn de qala setefê Xwedê dike. Di ya 3. de behsa melekan dike û li ciye-kî gava wesfî melekan dide weha dibêje:

*"Ne mér ú ne jin, bê xur-vexwarin  
Li şeklan qadir bi ceng ú per in"(r:4)*

Di helbesta 4. û 5. de behsa Hz. Muhemed dike. Di ya 6. de qala Mihracê dike. Di ya 7. de disa qala Xwedê, di ya 8. de ji qala fezile-tên Hz. Muhemed û eshaban dike ku di rîzakê de di behsa Hz. Fatîme û 'Eyse de weha dibêje:

*"Ji ammî melek genctir in ey ciwan  
Jinê dînyewi céter in ji horîyan  
Ji hindi jinan Fatîme pê ve da  
Li dû 'Ayîse ne heçî ma bega"(r:7)*

Helbesta 9. behsa pêxemberan e ku weha dest pê dike:

*"Çîhar ú sed ú bist hezar in nebî  
Resûl sêsed ú sézdeh in ey ebî  
Di Qur'an bist in digel heşte dî  
Kutub sed temam in digel çarî dî"(r:8)*

Di helbesta 10. de behsa du'a heye. Di ya 11. de qala imaman dike. Di ya 12. de qala ixtiyaran dike, rîzak jê weha ye:

*"Xuda xalîqê cumle fê'la te ye  
Welî ixtiyarı bi destê te ye"(r:8)*

Di helbesta 13. de qala 'elametên axirzemane dike û weha dibêje:

*"Zuhûrbûna Mehdi xurûca Deccal  
Dê nazil bi Isa ji bo zî(?) delal  
....."*

*We Yecûc ú Mecûc ku pir heybet in  
Digel dabbelî erdî roj derketin  
Ji mexrib ve ew ku ji wê derkevit  
Derê tobeâ dê li me dakevit*

*....."(r:10)*

dûmahîk r.7

## Bîrânînê Generalektî Tîrk

Cemal Madanoğlu  
Wergê: Alîşêr

-12-

Berî ku ez herim Qerargeha Fermanber a Hidûd, min seriyek da Fermanberê Cendirman. Fermanberê Cendirman ê Bajêr yekî kurtik û piçûk e, yekî ku ji Gumuşhacikoy a Qeyseriyê ye û jê re "Şekil Weziyet Ziya" dibejin...

Ji ber ku, wextê diaxive bi piranî dibêje "şekil û weziyet bi vî awayı" û didomine.

Min xwe da naskirin.

Ziya yê şekil û weziyet:

— Hewesa we ya wezifê kifş e...got.

— Ez tê negîhîstîm, fermanberê min.

— Tu li xwe nagirî ku sembla cendirmetî yê bi pêşîra xwe ve biki?

Ez bi pê re, di rewşê gîhîstîm:

— Ez benî, bi rastî ez nehatim vir, min nekarî ez bêm. Ez hatim ji bo qursa namzedîya kurnaytiyê; lê, di rasteqîni de ez ji kit'a we me. Em çarekî wê bibînîn û ez dest bi xebatê bikim.

Ziya Beg nerm bû:

Ji berika xwe torbek derêxist.

Di nava torbe da jî qurusek derêxist. Li zengil a ser masê xist. Poste hat. Pulekî erzuhalê da anîn. Daktilo kêşa ber xwe. Bi tiliyek, çat û pat, li ser devê min erzuhalê ji kolordiyê re nivisi...

Min musaede girt û dest bi qurşê kir.

Piştî du hefteyen din, em çûn Diyarbekirê imtihanê. Lê, pîr mixabîn di imtihanê de ez bi serneket im. Di serî de tektîk û di hemû dersan de, min puânîn baş girti bû; lê, di Fransiziyê de ez mabûm. Her wek di tektîk de, min li ser sedan 95 girti bû. Artilina dersekê gelek li min giran hat.

Lê, wextê ji bo imtihanê em çûn Diyarbekirê, min dît ku, Serokê Kurmayê yê Kolorduyê, Alikarê Fermanberê Alaya min a Nigde Remzî Beg bû. Remzî Beg, hînek meyxwer, yekî poz sorê mezin bû. Bi vî awayı li ser dihat qise kirin, li Mîrdînê wextê rûyê xwe paqî kirîye, duvpîşkela di nav pêşgîrê de xwe vesartî, xwe li pozê wî dixe û ew jiyanâ xwe zor xelas dike.

Remzî Beg gelek ji min hez dikir.

Min rewşâ xwe jê re got:

— Ezê emir bidim Tabûra Hidûd, tu here Urfayê dest bi mulhkîka xwe bike!..

Dom dike

## Li dînyayê gundê herî kevntirîn li Kurdistanê hat dîtin

Gurûbek arkeologên Poloni di serê meha Hezîranê de ilanî hemû cihanê kirin ku li Kurdistanâ İraqê, li Dihokê gundekî dîtin ku 10.000 sal berê avabûye. Yekî li ser navê gurubê ji ajansan re got:

— Ev warêni li ser hev, ne bes li mezopotamîyê, ew her wişa li tevaiya cihanê ji warêni heri kevintir in.

Ji şefen buroya arkeologiya İraqê Abdulqadir Hassan ji ji Reuter re got ku "Keşfa hatiye kirin dihere xwe dighine 8000 berî Isa".

Serokê grübê profesor Stefan Koslawski ji Üniversita Warşowayê li Bexdayê got ku "pênc xaniyên grover û rêzên kolanên(sokak) ji kevirê reş çekirî hatine dîtin; ku teqrîben 10.000 sal berê avabûye.

Ev gundê hatiye dîtin nêzi Dihokê ye, li nîvgiravekê ye.

Di mîcha Nîsanê de grübê arkeologên Fransız gotibûn ku, "me hîn bermahiyê 8000 sal berê ji kultura Mezopotamya dîtiye. Ev 1500 sal kevintir bû ji yêni berê hatibûn dîtin yêni heri kevintir in.

## Hevkariya Civaka Ermeniya û Kurda

-12-

## KARLANÊ ÇÂCANI

gîhandin hevdû û bi navê "Barzr Hayas Inkîrutyûn" navandin.(67)

Sala 1881'ê, meha gulanê bi serokatiya Xaçatûr Kereksoniy ev hevaltiya han bi navê "Paştpân Hayrînâns" hat navandin, ku teşkilat serihildana azadiyê ya nehîn hesab dûbû.(68)

Şêwra Paştpân Hayrînâns(Parastina Welat) ya sereke bir-yar dabû ku tevgîredana xwe bi Kurda re bikin yek ji bo bi hev re li hemberî her kirineke hukumeta Tirkîye şer bikin.

Hukumeta Tirkîye dît ku qeza Erzurûmê de Ermenî û Kurdan serî we hildane, biryar da ku bi çi awayî dibe bira bibe dawîya vê yekî bîne. Sala 1882'ya di meha Oktobîre de eskerî hukumetî ji Erzîncanê ber bi Erzurûmê de herikin, dêr û taxên Ermeniyandan ber topan, esker dîket her malake Ermeniyani, şik ji kî dikiş, digitin dibirin. Zâtirekê Kela Erzurûmê bi 400 Ermeniyâ tijî bûn.(69)

Avêtîs wê demê ji aliye hukumetî ve tê gerandin, lê zû bi zû bi saya dosten xwe yêni Kurd ji kelê azad dibe.(70)

Ji talebextî, teşkilata parastina

welat zêde debar nekir, endamên wê ji aliye hukumetî hatin girtin

û teşkilat bela bû...

du li hemberî her kirinek hukumetî şer bikin. Lî zûtir hukumeta Tirkîye pê dihise û dicehdîne ku bivê nevî wî biker. Lî zûtir hukumetî şer bikin. Lî zûtir hukumetî şer bikin. Lî zût

piye cand

**CİROK**

# ''NO KURDISTAN''

Rojekê riya min bi Stembolê ket. Ev dîtina min i pêşin bû. Gelek tişt li ser Stembolê diha-te gotin, piştî dîtina wê, ez bi xwe jî bûm şahid ku Stembol bi rastî jî bajarekî xweş e û hêja ye, li Tirkâ bimbarek be.

Min ê hevalek bidîta ku heft sala di zindana Diyarbekir de mabû û hê nû hatibû berdan. Min telefonî wî kir, da ku em hev bibin. Me wiha li hev kir; roja şembiyê li Siltanehmedê, li ber dêr-mizgefta Ayesofyê (berê dêr bû, paşê bû Mizgeft) seet... Ji xwe me herduya jî ciyekî din nas nedikir.

Di wextê xwe de ez çûme ciyê randewûyê, kesê min ê bidîta berî min hatibû. Mirov wek ku ne li Tirkîye be, turîst ji ''Tirkâ'' pirtir bûn.

Em çûn li ''Cafê'' yek ku turîst di piraniyê de ne, rûniştin û bi ecela bûyerên ku di nav heft salan de bûyine di nav 3-4 seetan de ji hev re bêjîn, me dest bi axaftinê kir. Di hepsê de ci bûye? Çawa lêdan xwarine, berxwedanê girtiyen bi kurtayî ji min re got û bê rawestan dest bi pirsên xwe kir. ''Rewşa hereketê çawaye? Yek bi yek hevalen kevn ci dîkin? Kî li kuderê ye? Kî niha ci dibê-

je?... Welhasil dixwest di nav sê seetan de şes salê ku ew ne ''jiyaye'' bijî.

Çiqa ez dixwazim bersivâ pîrsa wî bidim, her bersivêk dîbe sedema deh pîrsen nû. Sohbeta me her ku diçû germ dibû, em bi gotinek ku li van deran gelek kêm te bîhistin, ji bo gotina wê bi dengekî bilind, mîrxasî lazim e, varqîlin. Li masa pişt me du kesen biyani(turîst) û şagirt(garson) munaqeşe dîkin. Şagirtê ku li dezgehê rûniştibû, ji hevalê xwe pîrsi:

— Ciye, ci dibêjin?

Şagirtê din:

— Dipîrsin, Kurd li kîderî dijîn, Kurdistan li kure?

— Dev ji wan berde, bêje ez nizanim!

Ev axaftina di navbera herdu şagirtan bi Kurdi bû. Hîn werê, zilamekî din ji ser maseyek din rabû, bi gavên hîşk hate ber masa turîstan û bi dengekî bilind û ji xwe razî wek ku ji wan re xebera(çêra) bêje, qîriya ''No, no..., No Kurdistan''.

Herdu turîstan şas û ecêpmayı lê nîhertin, nîzanibûn wê ci bîbêjin. Lî camêre me îcar berê xwe da me û bi gûrûra bi cihanîna berpirsyariyek millî got:

— Hûn dibînin ku vana çewa ji derva dixwazin welatê me perçê bikin. Divê mirov derhal bide sekinandin, ne lazim e. pênc qûrişê wan serê xwe bixwî.

Piştî gotina wî qediya, wek gehremankî giran giran çû li cihê xwe rûnişt. Lî demek dirêj birr birra wî nesekin. Paşê em tê gîhaştin ku xwedîyê ''Cafê'' ye.

Turîst qasekî sar man, wek ku ''sûcêkî'' mezin kiribin, serê wan di ber wan de hesabê xwe dan û derketin. Wexta ku di ber me re derbas bûn û bi imrê xwe hema hinekî ciwantir ji ë din re got:

— Min ji te re negot bi herkesi re nepeyive!

Ev gotin bi Elmanî bûn. Xûya bû ku turîstên me Elman bûn... Lewra ku min çend gotinîn Elmanî zanibûm û sedemê êşa wan em jî êşandin û em jî rabûn û li pê wan derketin.

Piştî çend gavên fireh em gîhaştin wan. Roj roja Elmaniya min i tarzanî bû. Min jî forte xwe dida ku ez bi Elmanî zanim!

— Rojbaş. Hinek bêdil, lê bersivâ me dan.

## M.BOTAN

— Ger wexta we hebe, çayek me...

— Na sipas!

Me derdê wan zanibû, hîn di bin tesra bûyera ''Cafê'' de bûn. Divê me rî vekira.

— Em jî li Cafê bûn, bi rastî jî tiştekî ne xweş bû!

Dengê xwe ne kirin.

Piştî israra me, em çûn li baxçekî çayê rûniştin.

Pêşî hinek bêdil bûn, lê paşê dest bi pîrsan kirin. Xûya bû ku ne ji nezanî dipîrsin, gelek tişt zanibûn lê wan dixwest ji devê ''Tirk'' eki bibihîsta. Nêzî see-tekê bû ku em rûniştibûn, wexta wan teng dibû, uzrê xwe xwestin û rabûn, wexta ku xatir xwestin û navsere;

— Ev serê 15 rojan e ez li Tirkîye me, di her fersendê de min bi gelek kesan re li ser mesela Kurdan sohbet kir, a dawî min Tirkekî ku hebûna Kurda qebûl dike naskir.

Xûya bû ku wî min Tirk zanibû. Min got;

— Te hîn jî kesekî wisa nasnekiriye.

Şas bû û pîrsi;

— Çewa yanî?

— Lewra ez ne Tirk im, Kurd im.

— Ger tu jî ne Tirk bî, işe Kurda pir zor e.

**HINDIK\*\*\*\*\*RINDIK**

Ra amade dike : Z. XAMO

## PISİK ÇAWA DIBE PILING?

Generalên welatên NATO civînekê çê dîkin. General û Serokmar Kenan Evren ji di nav wan de ye. Bîskê nabênen didin civînê û ji xwe re kef û heneka dîkin. Ji generalan yek pirsekê davê ortê, dîbêje:

— Ku ji min re bîbêjin, wexta bi lez û bez û pirr ecèle pilinçek lazim be, hûnê çer bikin, çawa bigrin û bînin?

Generalekî Alman demekê difikire û di dû ra wîsa bersiv dide:

— Ezê herim nav daristanê, di bin darek mezin de korteç mezin bikolim. Ser devê kortê ji ezê bi qîş û qala bigrim. Ü ezê hêtek bizinê ji bi gulyê darê ve kim. Bê guman hêtê, tam di ser kortê re be. Ü dû re ji ezê torrek pîr mezin bigrim destê xwe, xwe di pişt darê de veşêrim û wek bizina bikalim. Piling wê xwe li deng bigre û bi xar were goşt û bê şik wê ''gum'' û di kortê werbe. Ezê ji tavîlê torré bigrim ser, bigrim û bînim.

General giş vê fîkrê pîr diecibinin. Lî belê bes yê Amerikî lîva xwe hildike, pîr na ecibîne, dîbêje:

— Temam, rast e, wer ji dibe; lî bi vî hawî pîr zahmet e. Mesela, ezê ji herim nav daristanê. Dev ji kort û morta berdim û xwe di pişt darê de veşêrim. Ü ezê dest pê bikim wek bizina bikalim. Gava piling xwe li deng girt û hat, hema ezê wek gulla devê tivingê ji pişt darê bi pengizim, sileha xwe bîşinim, ''gum, gum, gum'' berra piling dim, bîkujim û bînim...''

General vê ji gelekî diecibinin. Bes icar ji Evren Efendi murûzê xwe tal dike û hewak wer dide xwe ku, fena qerfê xwe pê bike... Generalek berê xwe pê da dike, dîbêje:

— Wer xuya ye ku pîr neket serê te, gelo tu bûna, te yê çer bikir?

Serokkomarê Tirkîye General Kenan Evren bi hawakî ji nava xwe têr dimizice, dîbêje:

— Ci hewce ye meriv rabe ji vir bide rî hetaa nav daristanê here. Ezê ji mala xwe derêm di nav bexçe de pişikekî bigrim, bavem bin feleqê, bidim bin çuya û li ceyranê(elektrîgê) girêdim... Pîr pîr piştî nîv seetê wê pilingiya xwe qebûl bike...



**1 Hezîran 1920:** Serihildana İbrahim Paşayê Mili

**1 Hezîran 1977:** Organa Komîta Merkezî ya Partiya Peşeng a Karkerî Kurdistan derket.

**5 Hezîran 1909:** Rojnama Peyman li Diyarbekir derket.

**5 Hezîran 1926:** Ji bo Müsil bi şiklekî resmi têkeve bin destê Iraqê peyman hat imzekerin.

**6 Hezîran 1913:** Kovara Rojî Kurd derket. Ev kovar, organa Civata Telebeyen Kurdish-Hêvi bû.

**6 Hezîran 1921:** Serihildana Koçgiri têkçû.

**6 Hezîran 1978:** Eziz Yusifi şehîd ket. Ew 27 salan di zîndanen Shah de mabû.

**6 Hezîran 1981:** Federasyona Komelê Kurdistan li Swêdê hat damezrandin.

**8 Hezîran 1969:** Bi navê ''Açlık ve Sefalet-Birçibûn û Sefaleti'' mitîngek li Hekariyê pêkhat. Ev mitîng DDKO ya Anquerê çêkir.

**11 Hezîran 1930:** Di bin seroktiya Salih Omurtak ordiya Tirk êris bir ser Serihildana Netewî a Agirî.

**12 Hezîran 1946:** Li Kurdistanâna Iraqê li bajarê Kerkükê kelk serî hilda.

**12 Hezîran 1962:** Helsbestvanê Kurd Goran li Sovyetê çû heqîya xwe.

**14 Hezîran 1934:** Nîzamnameya İskana Mebürrî derket.

**15 Hezîran 1978:** Rojnameya ''Ozgurluk'' -Azadi-derket.

**17 Hezîran 1926:** Jenosîda yekemîn a Agirî dawî hat.

**18 Hezîran 1919:** Emperializma İngilîza, Şêx Mahmûd surgûnê Hindistâne kirin.

**18 Hezîran 1947:** Mustafa Koşnav, Mihemed Mahmûd, Xeyrullah Abdulerkîm; ev sê têkoşerê Kurd li Iraqê hatin idamkirin.

**19 Hezîran 1929:** Jenosîda Stewîre(Savûr) dawî hat.

**19 Hezîran 1950:** Helbestvanê mezin Pîremerd çû heqîya xwe.

**20 Hezîran 1930:** Destpêka qetliama Zilan.

**21 Hezîran 1922:** Rêexistina ''Hêviya Kurd'' hate damezrandin.

**21 Hezîran 1930:** Simko şehîd ket.

**21 Hezîran 1978:** Nivîskarê navdar Ereb Şemo çû heqîya xwe.

**21 Hezîran 1978:** Mêrxasê jehatî Muhterem Bîçimli rehmet kir.

**28 Hezîran 1963:** 13 Kurd bi ithama ''damezrandina dewletê Kurd'' hatin girtin.

**29 Hezîran 1966:** Ji bo Kurdistanâna Iraqê otonomî hat qebûlkirin. Ev yek ji ali Serokwezirê Iraqê Dr. A. Bazzan hat beyankirin.

**30 Hezîran 1925:** Şêx Seîd û 47 hevalen wî li Diyarbekir hatin idamkirin.

**Hezîran 1937:** Kurda li Silêymaniye serîhilda.

**Hezîran 1975:** Ozgurluk Yolu(Riya Azadî) derket.

**Hezîran 1979:** Kovara Ala Rizgarî derket.

## Dimilkî ra çend nimûney

Dimilkî ca ra ca ferq keno. Cêr di ma Dimilkîya çend dewan pê vero nanê. Inîyan ra dewa Xoya (Geçit)(\* ) pabestey qezay Şonkuş(Çungus)î ya. Seki zanêno Şonkuş yew qezay Diyarbekir o. Dewa bîni yew dewa Ovacix (Ovacik)î ya. Ovacix zî yew qezay Tuncelî ya.

**Xoya/Şonkuş(Çungus) Ovacix(Ovacik)/Dersim**

|                    |            |
|--------------------|------------|
| 1 zû.....          | jû         |
| 2 didi.....        | didi       |
| 3 hîri.....        | hîri       |
| 4 çehar.....       | tsar       |
| 5 ponç.....        | ponts      |
| 6 şes.....         | ses        |
| 7 hewt.....        | howt(hewt) |
| 8 heyş.....        | heşt       |
| 9 new.....         | noû, noy   |
| 10 des.....        | des        |
| 11 zondes.....     | des û jû   |
| 12 duwes.....      | des û di   |
| 100 sê.....        | se         |
| 2000 de hazar..... | di hazar   |

## Fîlê "Ameyîş"î

Ovacix di:

**Demewo Nikayin(Présent)**

ez yon  
ti yena(persiyî di: ti yenay)  
o yeno  
ma yeym  
sima(sîma) yêne  
î yêne

**Demewo nikayin/neyn (présent/négatif)**

ez neno  
ti neno  
o neno  
ma neym  
sima(nêne) nêne  
î nêne

*Dûmahîk r.7*

Apociyan xortekî Kurdê din jî qetilkirin

## Serokê Komkar-Fransa şehîd ket

\* Apociyan piştî kuştina Ramazan Adiguzel, yek ji berpirsyarê KOMKAR'ê din jî, Huseyin Ali Akagunduz qetil kirin.

\* Cenazê Huseyin Ali Akagunduz ji aliyê meriv wî û hevalbendên KOMKAR û KKDK hate rakirin.



HAMBURG

### Li ser cînayetê Apociyan panelek

Piştî kuştina serokê KOMKAR'ê yê Fransayê Huseyin Ali Akagunduz li Almanya roja 25'ê Hezîranê li bajarê Hamburgê KKDK, Komkar, GAL-Grunen, Goçmen bi hev re konferansek çekirin. DKP, ATIF, KPD, AL-ST. Georg ji bi aktifî alikariya konferansê kîrin.

Di konferansê de bi dûr û dirayîjî li ser cînayetê PKK li hember welatparêz û şoşegeran ku welatên Ewrûpayê dide domandin hat sekînandin. Her kesî di axafîtina xwe de cînayetê PKK mahkûm û rûresî kîrin.

Ji nav mîvanan jî hin kesan ji berpirsyarê konferansê hin pîrs kîrin û berpirsyaran jî bersîvîn wan dan.

Cardin bi navê van rîxistinan belavokek û afîşek hat derxistin. Rojnaman 3 rojan li ser vê konferansê nîvîsandin û radyoya NDR banga konferansê belav kîrin.

Di konferansê de gelek kesen

*Destpêk r.2*

#### "YAN KURDISTAN YAN NEMAN"

bê armanc ne nezaniye? Heta kenîgî "otonomî"!!! Li hêla din komikên Kurdistanî li Sûrî û Ewrûpa rûniştine û dîkin Kurdistanê serbixwe û mezin bi belavok û rojnama ava bikin. Gelo mirov ji vê re jî zanîstî dikarê bêjê?

Pêşmerge mîr e, mîrd e, dîlsoz e, canfida ye. "Ya Kurdistan ya neman" gotina pêşmerge ye. Divê pêşmerge bi xwe li gotina xwe xwedi derkeve. Divê bixwe bîza ne ku cî dibêjî û xwîna xwe bi tenê bo serxwebûne birijêne. Lî bîla ne bînezanî be!

Nezakeke me ya din jî ev e ku em Kurd, hêzên Kurd hev naxeyîdin. Heger Iraq li Kurdistan Iraqê bixe Kurdistan Iran kîfîxwes dîbin dengê xwe dernaxin. Heger Iran li Kurdistan Iran bixe hingê Kurdistan Iraq dengê xwe dernaxin û dînav xwe de kîfîxwes dîbin. Li hêla din Tirkî çavşoriya xwe li Kurdistan Kurdistana Bakur dike, bi

*Destpêk r.1*

### Dr. İsmail Beşîkçi ji zîndanê hat berdan

civatek wiha de tahliyebûn(hatin berdan) nayê wê manê ku mirov gîhaştiye azadiya xwe. Li alî din, gelek pîrs û pîrsîrêkên kesenî li derive jî hene. Her wekî li unîverşitân zordariyek dijwar heye.

LI SER ZIMANÊ KURDÎ

## Civîna Berselonayê

Di navbera 18 û 24'ê meha Nîsanê de li Barselona-yê, civînek li ser zimanê Kurdî pêk hat, ku armanca wê hewldana ji bo rastnîvisîn, yekgirtin û standard-kirina zimanê Kurdî(zaravê Kurmancî) bû. Civîn ji bal Enstituya Kurd li Parisê hatibû amadekirin.

Di roja 16'ê Hezîranê serokê KOMKAR-Fransa Huseyin Ali Akagunduz 500 metre dûrî kome-la KOMKAR'ê ji ali provakatorî ve hate kuştin.

Huseyin Ali sala di 1960'î de li qeza Dêsimê Mazgirtê hate dinê. Xwendina lisê li Eleziz û Bingolê qedand. Piştî qedandina lisê koçî Fransayê kir. Ew li Fransayê aktivi ket xebata şoşegerî û ji sala 1983'ya û vir de seroktiya KOMKAR'ê dikir.

Li Ewrûpa kuştina şoşeger û welatparêzîn Kurd edî bûye karê yekemîn ê Apociya. Ji bo mirov bîkeve listeya Apociya ne lazim e mirov endamê PPKK an TKSP an endamê partiyek an rîxistinê be; mirov welatparêzîkî ne bi wan re be jî, ji bona wan bes e.

Kuştina Huseyin Akagunduz wek cînayetê PKK ên berê di nav rîxen welatparêz de bi nefretê tûj hat nîrîn. KOMKAR di 21'ê Hezîranê de bi belavokekê ve cînayet rûresî kîrin.

Cenazê Huseyin Ali ji aliyê malbat û mirovîn wî, hevalîn wî, KOMKAR û KKDK ve hat hilanîn. Rojnameyên Fransayê cih dan vê bûyerê.

### İcar dora pasdarê Xumeynî ye...

## Leşkerên Iranê sînor derbas kîrin û gundiye kîstin

Şeva 9'ê Hezîranê mufrezak(lî gor nûcîyênen rojnaman 20 leşker) leşkerê Iranê gîrtin ser gundekî Başqalê nêzî sînor. Ji gundiyan pêşmergên Partî Demokratî Kurdistan-Îran dipirsin; dibêjîn pêşmerge li vir hene, hûnê teslimî me bikin. Gundî dibêjîn tu pêşmerge li vir tune ne. Li ser viya mal bi mal digerin, lê tu pêşmergan nabînin.

Leşkerên Xumeynî piştî ku kesi nabînin, ji gundî gundiye kî (Gazî Koç) radikin û jê daxwaza nîşan-dana ciyê pêşmergan dikin. Gazî Koç vê daxwaza wan qebûl nake

### KUPA PARISÊ KURDISTANSPORE GIRT:

## Kolanê Parîsê bi şîara "Bijî Kurdistan" olan da



Piştî xebatek bi zahmet Kurdistan spor di grûba xwe de bû şam-û maçê 3-1 qezendî kir. Vê serkev-tina Kurdistan sporê kîfî şâhiyek mezin di nav hemû Kurdistan da çekir û gélé kesî ev serkevta li kolanê Parîsê bi seeta pîroz kîrin

Kurdistanspor maça xwe ya finalê bi taxima Vaires re kir. Li hember Vaires Kurdistan sporê lis-

peyvîn nû be (gava meriv mecbûr nemîne, peyvîn nû divê neyên afirandin).

c- Nêzîkbûn û nêzîkkirina zara-vayan divê esas be.

d- Peyv û gotinê kurt, sivik û rehet divê werin hilbijartîn. Ne yêntunt û tûj ku xelk jê fahm nakin.

e- Peyv û gotinê biyanî ku xelk jê fahm dike û bi kar tîne, divê werin bikaranî.

f- Herkes divê, ji serê xwe gotin û peyvan neafîrîne. Eger pêwîsti bi peyveke nû hebe, civîn divê li ser bipiyeve û bîryarekê bide.

g- Xebat divê neyê lezandin û li gor qâideyên ilmî be.

• • •

## Urfî idare wê bi nav rabe, lê bixwe bimîne

hat şandin. Li gor tebligâtê urfî idare qâso 19'ê Tîrmehê de wê bê rakirin, lê di şûna wê de Kanûna rewşa awarte(rewşa fewqilade) bê li darxistin.

Bi vê yekê di esasê xwe de, di

kar û barê meşandina dar û dez-gîn diktatoriye de tu guhertin çenabin. Ferq ew e ku berpirsyarî ji fermanberên leşkerî têngirtin dikevin destê waliyên bajaran.

## Weşanênuh

### NÜBAR

Ev pirtûk, Ahmedê Xanî di Adara 1683'an de nîvîsandiye. Yek ji klasikên Kurdi ye. Pirtûka berê bi tipêr Erebî di nav mîlet da hebû, nuha Weşanênuh Roja Nû ew di gel Latîniya wê ji nuh ve weşandiye. Latîniya wê 39 rûpel û Erebîya wê 37 rûpel e.

Adresa destxistina pirtûkê; Weşanênuh Roja Nû, Dobelnsgatan 16-B, 113 58 Stockholm.

### MEWLÛD

Mewlûda Mele Ahmedê Batê bi tipêr Latîni ji aliyê Weşanênuh Roja Nû ve hatiye çapkirin. Ev mewlûda Kurdi ne kîfî kija salê hatiye nîvîsandin. Lê mirov bi riya tarixa jiyanî nîvîskarê wê bi kîmanî kare hîn bibe ci demê hatiye nîvîsandin. Mela Ahmedê Batê di nav salê 1417-1491'ê da jiwaye. Mewlûd cara yekemîn sala 1906'an li Misrê, cara duduya 1919'an li İstenbolê hatiye çapkirin. Ji ber çapkirina pirtûkê Kurdi yê dînî li Tikiyê qedexe ye, gelek caran li ser tarixa çapkirina kevn pirtûk ji nuh ve têngirtin. Ji ber vê yekê mirov bi rastî nikare bêje, ev pirtûk çend cara hatiye çapkirin. Ev mewlûda ji 19 beşâ û ji 582 beyta pêk tê. Pirtûk 63 rûpel e.

### STOKHOLM TE CI DÎTIYE BÊJE

Bi navê "Stockholm Te ci Dîtiye Bêje" Bavê Nazê pirtûkê nuh derxist. Ev pirtûk çîrokek dirêj e. Pirtûk 122 rûpel e.

### THE YEZIDIS (EZIDI)

Nîvîskarê wê: John S. Guest, kitêb ji ali Weşanênuh KPI Limited de di 1987'an di li Londrayê hatiye çapkirin. Kitab bi İngilîzî ye, û ji 317 rûpel pêk hatiye, herweha tê de 32 foto û wêne-yen bi destâ çekirî û 2 xerîte ji heye. Di xerîteyan de cihhê Ezidiyân nîşan daye. Nîvîskar tê de ji destpêkê heta roja iroyîn qala Ezidiyân û dînî wan dike. Li dawîya kitabê nêzî 500 çavkaniyênuh ku nîvîskar jê sâd girtiye heye.

### LITERATURNAYA I FOLKLORNI- YE VERSII KURDSKOY POEMI "YUSUF I ZELIXA" (WERGERA DESTANA EDEBÎ Û FOLKLORİK A KURDİ YUSUF Û ZELİXA)

Nîvîskarê wê: M. B. Rudenko. EV kitêb ji ji ali Weşanênuh NAUKA, di 1986'an de li Moskova'ye hatiye çapkirin. Kitab bi 372 rûpel e. Piştî pêşgotineke bi Rûsi, wergera Rûsi ya destana Yusuf û Zelixâ heye. Ji rûpel 179 ta 292'yan bi herfîn Erebî lê bi Kurmancî teksta destana Yusuf û Zelixayê û piştî wê bi herfîn Latîni bi Kurmancî çend varyantên Yusuf û Zelixayê cih digre. Li dawîya disa bi Rûsi noten nîvîskar heye.

Destpêk di rûpelê 4'an de

## MELA XELÎLÊ SÊRTÎ (1756-1841)

Di helbesta 14. de jî qala qebr û qiyametê dike û di rêzêkê de di behsa cennet û cahnimê de weha dibêjê:

*Li esmanê heftî ye cennet niha  
Cehennem li bin erdi ye her weha'',  
(r:11)*

Her disa di eynî helbestê de; di behsa ku gunchkar pişti cezê xwe dikşînîn û ji cehennemê derdikevin de weha dibêjê:

*Guneñkar paşî dê jê derkevin  
Tu caran kafir biderakevin  
Zulm nîne 'edl e heçî ku biket  
Di milké xu da ew teserruf diket.  
Lê her yek ji me kafirek wî heye  
Bi fedla Xwedê ew fidayî me ye''(r:11)*

Di helbesta 15. de qala çar imâm û mezheban, di ya 16. de jî qala tesewwuf û exlaqê dike, jê du malik:

*Tu malê ji xwe zêde teleb meke  
Di şolan de cehdê û sebrê bike*

*Mirovê nemahrem tu têkil mebe  
Mijûli ji eyba pirtir mebe'' (r:14)*

Di helbesta 17. de behsa fêrbûna riya Xwedê dike. Di ya 18. de qala endamên wicûd dike û dibêjê heft in û di malikekê de weha dibêjê:

*Zikê te te'amê dixwe hel diket  
Di uzwan de xuyî û menîyê pur diket  
Bi xûnê tu tâhsilê ta'et dikey  
Bi ya dî biçûkan peyda dikey'' (r:19)*

Helbesta 19. li ser awayê xwarinê ye ku emê vê helbestê bi tevayî di dawiya vê nivisê de binivisîn. Di ya 20. de jî qala cil û bergen dike û di malika pêşin de weha dibêjê:

*"Libasê ji bo fexr û kibrê mepos  
Mucurred ji bo ta'etê wî bîpos'' (r:22)*

Di helbesta 21. de qala awayê nimêj û ibade- tê dike, malika pêşin weha ye:

*"Ji bo te Xwedê çekirin ev nimêj  
Ew in yê nehêlin bibînî tu qirêj'' (r:22)*

Helbesta 19. ku li ser awayê xwarinê ye ev e: Mebhess adab el-ekil (Li ser awayê xwarinê)

Xwedê ev te'amê di xoş dane te  
Digel av û fêkî libasê li te

Destpêk r.5

## SEMÎNERA YEW JAPONÎ Û DIMILKÎ

Ovacix di:

**Demewo viyarte(Prêtérit)  
û neyina jey**  
ez amâz neyina  
ti amâti neyina  
o amâlo neyina  
ma amaymâma niyamaym  
sima amayşima niyamay  
î amayî niyamay

**Derdere(Ibikkaya)  
/Şonguş(Çunguş)**  
ez amawa  
ti amayê  
o amawo  
ma ameyê  
şima ameyê  
ê ameyê

Emr(imperatif): bê !  
bêre !

## Fîlî "piro dayîş"î

Alduş(Gerger)  
**Demew nikayin**

**Demew viyarte(passé)**

ez o dana piro  
ti yê danê piro  
o yo dano piro  
a ya dana piro

|               |                    |
|---------------|--------------------|
| mi da piro    | la chèvre          |
| to da piro    | dar.....l'arbre    |
| ey day piro   | dik.....le coq     |
| ay day piro   | ga.....le boeuf    |
| ma day piro   | golik.....le vau   |
| şima day piro | hari.....la terre  |
| inan day piro | kavir.....l'agneau |
|               | kel.....le bouc    |
|               | kergi.....la poule |
|               | la.....la rivière  |

## Çend persî û cewabê Kojima'y

Peyniya semîneri di goşdaritoxan ra yew, Kojima'y ra persa, va:  
- Ti senêwa xebetiyyatî?

Kojimay va:

— Mi meseley nuştînî, be'dî mi qayıdey gramerî tira vêtînî. Verî xor- tan qali kerdinê, dima exteran temam kerdinê. Gilangan zî mi ê tehrîk kerdinê(herişnaynê). Înî têver naynî, mi zî nuştînî.

- To Dimîl(Zazay) senêwa şinasnay, çîri ti jînî sero xebetiyyat? Qey la Huk- mate Tîrkan nêdiyin ki ti xerib î?

- Pancê(15) seri ra ver mi Tîrkan ra hes kerdinî. Ez di ray şiya Tîrkiya hameya. Ez bixo filolog a. Ez hewniyaya ki tayna zanî(zıwanî) Tîrkiya di qalî benê, mi ma'limandê xo di qalî kerd, va 'baş o, sero bixebediye'. Ay zeman ra ez şona yena. La wexto ki mi Tîrkiya di vernawo pê sero hewt(7) seri keno. Ez xerib a, mi dîqqet antînî, semedâ a ra her dewi di ez yew-di rojî mendînî. Eki mi bişînaynî, çend aşmî ra pey gilana ez herinda xo ra ayeşraynî. Mi adresâ şarî qet nêgirewtînî. Tulu- ma hewnî (bi Frensi: sac de couchage) û firçey dindanan vişer çi mi di çinêbi. Kurdî hewl ê, nan û awka mi daynî. Ez hîre-çêher şewî zi tebera, yaban ra kuşta(kışta) kewta. Ez şînî heyana ki roj şînî awan,

kewtînî hetana ki bînî nimaj(şefeq), gilana ez rer(rayir) kewtînî.  
— Hukmatê Tîrkan senêhewa to hesiya ow dima se kerd?

- Ez Çerkezan û Lazan sero zî xebetiyyawo. Yew ray mi Lazan reydi kay kerdinî ow ma Lazkî deyrî vatînê, yew polis çeqan ser kewt(ferd kerd) ki ez xerib a, ez Japon a û Lazkî deyrî kena, gerez mi kerd. Polisê Tîrkan (MİT) ez tebişa, notanê minê nuştan ra hewniya, labrê semedo ki mi elfaba Japonkî reydi nuştî bî, tira çîyekî fahm nêkerd. Labrê ez Tîrkiya ra teber kerd, mi ra va "Tîrkiya ra vejê, şo hewna hewna zî mey inî herran, nêki ti zanî !" Aya ra pey ez Tîrkiya ra vejîyaya. Inka hima tikê gurey(karê) mi konsolosxaney Tîrkiya heti mendo coka inka ez nişna zav qalî bika. La key ki mi tezê xo da, zav çi esto ki ez hima Kurdan sero binusa. Ez tezê xo Japonya di zî bi zanê(zıwanê) Japonkî teb' (çap) kena.

(\*) Kojima'y nî kelimey zî dewa Xoya(Gecit) ra nuşte:  
**Dimilkî Firensizi**

|                    |                                       |
|--------------------|---------------------------------------|
| bizi.....la chèvre | leylek(leyrek)...le petit des animaux |
| dar.....l'arbre    | manga.....la vache                    |
| dik.....le coq     | meywa(meyve)....le fruit              |
| ga.....le boeuf    | nal.....jeune vache                   |
| golik.....le vau   | rîçik.....la racine                   |
| hari.....la terre  | ro.....la fleuve                      |
| kavir.....l'agneau | sîy.....le caillou                    |
| kel.....le bouc    | vas.....l'herbe                       |
| kergi.....la poule | velg(velk).....la feuille             |
| la.....la rivière  | vîlki.....la fleur                    |

Destpêk r.8

GİRÎNGE HUNERMEND LÊKOLÎN Û  
LÊGERÎNEK MEZIN BIKIN

Hema ez rûdinêm û ji xwe re difi- kirim û digrîm.

Dema min tembûr da desten xwe û bûm hunermend, herkes şaq û mat ma. Gelekan digotin "ma gelo ev çawa dikare bi Kurdî û Kurdistân stranan bêje. Hêviya xort û keçan bilind bû. Cesareta wan zêde bû. Di şapaten pêşiyê de gelek sipasîyen xwe pêşkêş kiirin. Lî vê gavê ji ew kesen ji stranen min Kurdî û Kurdayeti fêrbûne, devê çekê ji ser dijmînê me vege-

randine û bi xwe û bi me de kirin. Hîn duhûnî min digot "edî besê rabe ji xew, xortê hêja keça bedew". Ji xew şiyarbûn û deve çekê bi hevalê xwe û me de kirin. Haho haho hahoooooo.... ji derdê vê karekterâ xerab. Ma la lawo me got li dijmînê xwe xin ya li me xin.... Van bûyeren dawîyê sedised zîrât dide herkesi... Edî hawar hawar hawar hawar..... heyf û inixahbin.....

Destpêk r.1

## EZ BI WE RE ME

e. Em bi we re ne. Hûn jî dengê doza Kurdistan bilindkin, bi vî awayî mirovayî hay ji doza we dibe. Divê hûn agehdariyê berfi-rehtir bikin. Çunki mirov li ser vê yekê tu tişti nîzanîn, heta yê ku doza we nebibistibin gelek zêde ne. Ku em vegeerin ser min, ez bi we re me. Ji bal min ve tu problemek we tune, mesele mirovân din in. Divê hun mirovan qezencî doza xwe bikin. Hûn çicas têkoşin bidin hewqasî dikarin wan qezenc bikin. Ew, wek gelek mirovân din têdiçoşin û di van meselan de bes beyan têrê nakin, divê ew bi xwe bén iknakirin.

Van hemû tiştên ku ez dibêjim têra iknakirina mirovan nakin. Helbet hûn ne bi jenosidkirina Tîrkan-lewra ev hema bêje qet alîkariyê ji we re pêk nayne- bi iza-hen xwe karin qezenc bikin.

- **Gelo em dikarin hêvîyekê ji Konseya Aşî ya Dinê bikin ku konferansek navnetewî li ser doza Kurdan li darxe. Dîtinê te li ser vê yekê ci ne?**

- Çîma na!.. Ev girêdayî bi wê yekê ye ku gelê Kurd vê ji me bixwaze. Ger hûn pêşîyari me nekin, em nikarin tu tişti bikin. Em ji amade ne, lê divê hûn jî bidin xuyakirin ku daxwazek we ya wiha heye.

- Di destpêka Adara îsal de, Tîrkiye bi piştgiriya emperyalizma Amerika bi 30 teyarên bombardûmanê êrişâ xwe ya sisîyan -ku ji 1983'yan û vir de pêk têrê bir ser gundê Kurdistanî Iraque. Haziriya îsgala Kerkükê û Mûsilê dike. Ev, binpêkirina esasî yê hiqûqa navnetewîne. Konseya Aşîya Dinê di vî warî de ci dike?

- Em protesto dikan. - Di nav dilê Rojhilata Nêzik de mîletê Kurd û bi 25 mîlyonan perce bûye û ji hemû mafen xwe yê millî bêpar hatiye hiştin. Gelê Kurd ji bo azadî û serxwebûnê ev bi sed-salan e ku bi mîrxasî ser dike. Lî mixabin, di vî serî de iro wê piştgiriya navnetewî ya ku layiqî wî ye negirtiye. Li gor te sedemîn vê ci ne? Ji bo bi navdînêkîna mesela Kurd divê ci bê kirin?

- A çetirîn hûn dizanin... Herwe-kî di mesela Qibrisiya de em piştgiriya xwe ya berfirê ekere dikan. Lî di dawîya dawî de her tişt girêdayî bi wan e, divê ew bi xwe li riya helkirin bigerin û biserkevin. Ez dikarim di ditinê cûda de bim, lê di cewherê xwe de ev dimîne meselek wan bi xwe. Em bes dikarim piştgiriya mirovân têkoşin bidin. Hûn ci rê û dirban bikartîn, bi ci awayî bikartîn, ev mesela we ye û divê hûn bi xwe bîryara vê yekê bidin. Em bes dikarim piştgiriya we bikin.

Ger kesek ji we re bîbêje ku hûn ê ci bikin, ..... ditinê xwe de be, ew ne hevalê we ye. Çetirîn hûn zanîn ku divê ci bê kirin. Hûn dikarim bixwînîn \* Sipas

XELKÊN SER SÎNOR DI  
QILQILÊ DE NE

Me berê ji nîvîsandibû, lê car- din em hewcedariya dubarekirina vê nûça xwe ne. Ji ber ku roj bi roj tehdît û êrişen dewleta Tîrkiya a faşist zêde dibin û eva han ji, xelkê Kurd û ser "sînor" dixe rew- şeke gelek teng.

Edî, niha ew sinorîn ser perçen Kurdistanî hin xeterir bûye. Xelk maye di navbera du keviran de. Yan ji mirov dikare bêje; rewşa xelkê wek destê bin kevir e, tu bikesî dişê û nekêsî dişê.

Xelk dibêje baş e madem xete- riyek êrişâ ordiya Tîrkiyê heye, bira çekan bidin me, em xwe bipa- rêzin an hûn nadîn musade bikin em bi xwe ji xwe re bistinîn. Mixabin ev her du pêşîyari ji nayen pêbû kîrin. Ji ber vê, mirov dikare bêje, ku halek wiha xirab û jiyaneb ki vî awayî dudili, Kur- den Suriyê yê ser sînor xistiye nav qilqilek giran.

Xwendevanê Armancê

## ŞIVAN PERWER

# ”Girînge hunermend lêkolîn û lêgerînek mezin bikin

Di vê hejmarê de, ji bo xwendevanên Armancê, me hevpeyvînek bi Şivan re çêkir. Şivan, bîr û baweriya xwe ya li ser huner û kar û xebata xwe pêşkêşî xwendevanên me kir.

— Heval Şivan, ji ber ku xwendevanên me te dinasin, di vê hevpeyvînê de, ji jiyana te bêtir em dixwazin li ser kar û barêne te yêngi çandî û nêrinêne te yêngi li ser mûzîka Kurdi aghdarî bistin. Gelo heya niha çend kaset û plak amade kirine?

— Ji 1976’an û vir de min zêdeyi 20 kaseten mûzikê, 2 sêlik, 2 kaseten zarokan bi stran û çirok, 3 video film, 4 kaseten mûzikê ji Gulistan û çend kaseten mûzikê ji bo kesen din çekirine. Lî beriya sala 1976’an ji min çend sêlik û kaseten mûzikê çekiribûn, ew iro di destê herkesi de nînin.

**- Berî ku tu ji Kurdistanê werî Ewrûpayê, ango heya sala 1976’an te çar kaset û 2 plak amade kirine. Eger tu kaset û plakên xwe yêngi wê demê û yêngi dema Ewrûpayê bînî ber hev, gelo di navbera wan de çi ferqiyetê girîng hene?**

- Helbet di nav kaseten dema Kurdistanê û yêngi Ewrûpayê de navberiyake mezin heye. Koka stranen min ji Kurdistanê tene. Xwezaya Kurdistanê av, çiya, hewa û axa Kurdistanê van stranen aghdarî. Ez ji di nava vê ax, av, hewa û çiyan de mezin bûm û bûm Kurdeki herweha.

Dema li Kurdistanê bûm, her tiştî li ber çava bû. Her bûyer ji jiyana me der dihat. Edî rengê jiyane bi his û baweri çekirina huner pêşkêş dikir. Çün û liva min, war-guherandina min, li her gund û bajareki îlhamek nû dida min. Stran didan ber min û stran avrande dikir. Meta Eyse, apê Hesso, xûcxa Zinê, birayê Şerko, her-yek stranek bûn. Herweha Kurdistan bi navê xwe stranek mezin e. Lî Ewrûpa rengê stranen diguhere, hissen stranen dikuje, warê stranen teng dike. Ji ber ku di her tiştî de guhertine mezin heye. Nemaze herdu berbiçav in. Kurdistan ku der û Ewrûpa ku der. Weke ciyayê Alp û ciyayê Sipanê ji hev biferqir in.

Lî hûnê bêjin ”stranen te li Ewrûpa çekirine ji, gel xwedî lê derketiye” gelo ma ev mesele ci ye? Ev ji şopa kevn de wertê. Bi kurtî ez li Ewrûpa me lê koka min li Kurdistanê ye...

**- Em dizanin ku ji bili stranen folklorik te helbesten Cigerxwîn rehmeti ji bestine(anîne ser meqam). Gelo te heya niha çend helbesten Cigerxwîn bestine. Di vî karî de dijwariyê te ci bûn?**

- Li derî stranen min û yêngi folklorik (bigotina we) min gelek stranen Cigerxwîn xwendine. Piranî mûzikâ wan ji min çekirine. Nizanim min çend xwendine lê dixwazim hemûyan bi nota bikim(bestinim). Ji ber ku hemû stranen Cigerxwîn hêja ne, di vî warî de Cigerxwîn gelek mezin e.

Di vî warî de bawer nakim ku zoriyê min hebin. Ji ber ku dema Seyda rêze(text) nivisandiye, hemû his û ramanî û heyecana xwe xisitiye nav rêzan û gava mirov dest diavêye rezeyen wî, melodî bi xwe dertê holê. Ji wan re helbet hineki hostatî û hunermendi girîng e, ku mirov karibe Seyda his bike û ramanen wî bifikire.

jî weke her Kurdeki vî besi, ta universtite bi zimanê Tirkî xwendin kir û hatim tebitandin. Lî koka darê nehat û nikaribû bête qutkirin.

Hûn dizanin iro hozan û hunermendê li Tirkî naskiri, bêtirên wan Kurd in û ji bo çend quruşan huner û çanda gelê Kurd kirine pergende. Ta iro ji ev tiştî hîn aktif e. Helbet bixwaz nexwaz wê li ser insanê Kurd ji wê tesira çebibe. Demakê eyni tiştî li ser min jî çebû. Lî malâ dengbêj û çirokvanan, mala Cezrawiyan û Kawis Axan ava be ku ev rewş hineki berteref kirin. Ger hunermendek, yan dengbêjek çiqas bi Tirkî bêjî li koka orîçinal zêde tesir nake. Anglo dengbêjek, inkarvan, tere-paş, çiqas Tirkî bêjî, gava Kurdi bixwîne wê Kurdi ji Tirkî bastır bixwîne. Ji ber ku Kurdi serhatin e, bingeh û orîçinal e. Di vî warî de min dest ji orîçinalita xwe berneda û eynat kir. Dilê min nextwest bi zimanê kedxwaran bistîrem û dijminê gelê xwe bim. Kurdi dayika min e, bavê min e, av û nanê min e. Kurdi axaftin bi xwe weke mûzik e.

**- Qasî ku em dibînin, van demêne dawî tu giraniya xwe didî folklor Kurdi. Gelo tu dikarî nêrinê xwe li ser vê yekê ji me re bêjî?**

- Belê rast e. Lî min hemû giraniya xwe hîn nedaye ser vê xebatê. Sebeb ji ev e; Min çavê xwe di nava her babet zorîyê jiyane de vekir. Rengê evinya bi kîfî ji bi kul û derd kete dilê min. Min dixwest di her barê de işyan bikim, lê car heye ku işyan evîna xwe bi xwe dikuje. Herki bi emir dibim dijîyanê de li tecrûben nû rastêm, gulen nebişkivi bi baxxçeyê min de vedibin. Ez bawerim ji vir wa ezê giraniya xwe bidim ser vê hîla xebatê. Ji ber ku ev ji parçekî jiyana gelê me ye. Girîng e di her warî de eymet û serhatinê jiyane bêtin ziman.

**- Li ciyekî de, dema tu qala sedema meyla xwe ya bi mûzikâ Kurdi dikî, heremên ku zarotiye te lê derbas bûye tîmî holê û dîbêjî ku malbata te û dengbêjîn Kurda te afirandîne. Bi ya me ji ev gotinek di ci de ye. Lî dema te lisayê qedand û wek dengbêjî hatî naskirin, di wan salan de li Tirkî yêngi ku bi Tirkî distran û dengbêjîn ku ji wan re ”ozan” dihatin gotin, hebûn. Ma gelo tesîra (ci erînî û ci ji neyînî) wan dengbêjan li ser te bû?**

- Ez ji dayikek Kurd û baveki hatim rû dinê ku ji Kurdi bêtir tiştîk nizanibûn. Mala me hemû cotkar in û ji mûzikê ji gelek hez diken. Bavê min bilürek xwes ledixe û dengê wî gelek xwes e. Xala min ji were ne. Ez bawer im vê gavê kijan birayê min bête tebitandin, wê jê hunermendekî bas derkeve. Lî wan hemûyan mela xwe dane ser min. Ano vê gavê ez bi navê wan hemûyan distîrem. Bi ziman û çanda Kurdî şin hatim. Lî mixabin di rewş Kurdistanê de her tiştî bê dawazî ji xwe ber e. Çareya xwe nîne ku mirov di tesira çandek din de ji nemîne. Ji bili rad-yoya Kermanşan, Bexdad û Erivanî derdora me hemû Tirkî, Erebî û farisi ye. Li parê Kurdistanâ Tirkî bêtir her tiştî bi zimanê Tirkî ye. Hûn baş dizanin ku weke kedxwariya abori, zimanê Tirkî ji kedxwarê zimanê Kurdi ye. Min

nagihê daxwaziya xwe û herweki şehid dibe, ji bo şoreşê ji zilm e, tadeviye, daxwaziye û mirov ji bo wê şehid dibe. Li hêlekê jana evîn tête gotin û ji mirovan ra dibe hînker ku mirov bi hev dişin, li hêla din ji mirov ji bo şoreş dimirin û zilm û zorî, kustin ji yekî ra dibe hînker û mesel. Mesela evîna dil ji jor de tesîri mirovan dike. Şoreş ji kok de diguhere. Werdawî herdu di nav hevde ne, şoreş bê evîn nabe, jiyana bê evîn nabe. Şoreş evîn diparêze, evîn şin dike, gulen evîn başdır vedibin û evîn ji zilmê xelas dibe. Lî şoreş bê evîn ji weke darek hişk e, bê fêki û bê rêsî ye. Dilê bê evîn kevir e û ne dostê şoreş ye. Ger mirov evîndarî Kurdistanâ ne be ticar mirov nikare xelas bike. Kesen evîndarî jiyana xwe ne be, nikane biparêze. Dilê evîndarî jinê ji nebe, xweşîya jiyane nizane. Jinê ji xwe nahhesibîne û hîn paşverû û tarîqatî ye. Jin û mîr jiyana in. Girîng e di nav wan de hertiş bi evîn bibe.

**- Van salen dawî tu çûyî welaten wek Avustralya, Dewleten Amerika Yekbûyî û Yekîtiya Sovyet û te li wan deran konser da. Tu kerema xwe dikarî hînek aghdarî li ser van konser û guhdarîn xwe bîdî me?**

- Di van salen dawiyê de gelê Kurdi ji ber motifên politik û abori(ekonomik) bi kesan, bi qeflan ser belayî dînyayê bû. Weke rewşa Osmanê Hono-Lûlû pergende bûne. Di sala 1985 an de ez li Amerika bûm ji bo konsêr. Ji çend beşen Amerika şûnde çum California. Kurderweran ji San Francisco ta Los Angeles û San Diego li gel min meşyan û kar û bar birêve birin. Li rûniştinekê min hal û demê hinekan pîrsî; li ku deverer dirûn û ci karî dikin; Çendek ji wan li doravên diman. Yekî jî ji wan -gellek aktif bû Osmanê Hono Lûlû bû. Osman bi hevalen xwe ra kar û xebatek welatperwera ba dikir.

Konsêr min e Amerika bi destî Farisan, Ermeniyan, Tirkân û Kurdan dihatin amadekirin. Gelek kesen Amerîkî ji besdar dibûn. Dilê wan bi mûzikâ Kurdi gelek şa dibû. Eyni tiştî li Canada ji reng dida. Lî di vî warî de gazincek min e mezin heye ji weşanen Kurda ku li ser vê xesbat min nesekîn û agahdarî gelê Kurdi nekirin. Ji ber ku karekterek me Kurda xerab heye em bi tiştîn hûrik xwe geleki berçav dikin, lê bi tiştîn mezin ji serwendayî ne. Ma gelo mirov behsa tûrek(tûrne) Amerika û Canada nake ku bi serbilindîya musika Kurdi moralê gelê Kurdi pê çêbibe. Ji ber ku li gel çunek Amerika qasî 20 konsêr didim. Bi hezar mirov besdar dibin û nav û dengê Kurdi dibihîzin.

**- Tu ji dengbêjîn Kurda kijan zaftir hezdikî?**

- Ez ji hemû hunermendan hez diken, ger bi rastî hunermend bin. Lî bi taybeti ji Cezrawiyan, Meryem Xan, Kawis Axa zedetir hez diken. Di vî warî de cihê Kawis Axa, Meryem Xan û M. Arif Ceza rawi bilindir e. Gerek di Kurdistanê de heykelê van mirovan bête danîn.

**- Tu ji hevalen ciwan ku li ser muzika Kurdi xebatê dikin ci tawsîye dikî?**

- Tawsiya min ev e ku gereg kesen dibêjîn em hunermendan hema tembûrê weke copekî nedin desten xwe ci hat ber devê wan nebêjin. Ji ber ku di musiki de hunerê Kurdi gelekî bilind e. Girîng



hunermend lêkolîn û lêgerînek mezin bikin. Ano alternatifekê dirist bikin.

Hûn dizanin em ne xwedî dewlet in. Di vî warî de hêzeke ku bikaribe li pişta huner û hunermendan ji bisekine û wan pêşve bibe, pêk nehatiye. Her tiştî li ser afirandinê gelê Kurdi sekiniye. Ger piştigiri kêm be ji, disa ji bo pêşvebirina mûzikâ Kurdi bûyer têr in, ger mirov bi rastî bixwaze çêbice. Klasîken Kurdi weke kaniyake bê binî ye bi xweza û origînalita xwe. Gelê Kurdi bîş û jan, dilbirîndarî û têkoşîna xwe xezînake mezin ji bo huner û hunermend amade kirîye. Bi nûjeniya rojani ev xezîna bedawî têr û bes e.

**- Li gor te dijwariyê mezin-tirîn ku li hember senhetkar û dengbêjîn Kurda dertîn çine?**

- Çawa yanî, tew hûn dibêjîn dijwariyê li ber hunermendan(lolo). ma dijwariyê ku hunermendan Kurdi tê de ne, qet li ber hunermendan welatekî din yan mîletekî din hene? Dewlet tune, pîbarî tune, kemasîyê abori gelek in, girheviyê siyasi tesîri wan dike û ya mezin ji qedexekirina hemû eymeten Kurdi li ber hunermendan bendeke mezin e.

**- Li gor te dijwariyê mezin-tirîn ku li hember senhetkar û dengbêjîn Kurda dertîn çine?**

- Belê, gelo çîma zarok?.... Mane em ji duhuni zarok bûn. Dayik û bavêne me, derdora me, ji me ra çi gotin, ci bi me ho kirin, me ew hilanî. Ger em tiştîn girîng ji bo hatina zarokan hazir nekin, wê zaroken me çawa têbigihîjin. Zarok hêvî ne, zarok jiyana in û zarok hatin in. Ji bo sibê yêne xwe-diyê welatê me bin, zarok in. Ger em ji bo wan nexebitin, wê bi ci bin?... Ya wê bi Tirk bin, yan Ereb, yan Faris û yan ji bêxwedî bin. Ta vê gavê kesek li ser vê rewş(jî çend pirtûk û kovaran pêve-tir) nesekînîn. Ano li ser tiştîn ku zarok jê baş fêm bikin û fêr bibin, nesekînîn.

Ger, weke milleten dinê Kurdi qîmete bido hunermendan xwe, bawerim hunermend wê çar qat pêşve biçin. Hemû qedera hunermendan bi çar şevan va girêdayî ye. Ev ji bi berbirr û serbirr dibe. Filan hunermend nehat şeva me, loma ne tiştîk e, filan hunermend çû şeva filan kesî, oportunist e, revizyonist e, pasifist e, pasiverû ye, menfeetçi ye, perexwaz e, çiqas bilind be ji tesîra wî yan wê hunermend tête şikandin. Edî hunermend û liberxwedana xwe li gelhev diminin. Meselein; di Newroz 1987 an de ji ber hin sebeban ez negîhistim şeveke newrozê. Edî ci hate ber devê wan, nîvîsandin û gotin. Qasto wan xwe kirine ”Hêviya Gel”. Bi bawerîya min ew û ”Hêviya Gel” in. Hebe tînebe ev bê hêviya gel in. Ez nîzanim vana wê ci wext hatina gelê Kurdi bifiskirin. Ger hêviyek hebe ji, difetisînîn, diqedînîn. Ewê ji rojekê rastiyê fêm bikin, lê wextê derbas bûbe.

**- Te giranî daye ser filmê Kurdi ji, tu ci ji vê yekê dipêyi?**

- Di sedsala 20’ an de sînema, film roleke mezin dîlze. Bûye propagandake mezin di her warî de. Bi bawerîya min ger filmê Kurdi ji pêkbe wê weke şoresekî tesîr bike. Her gund û bajaren Kurdistanê tije bûyer in. Her bûyer û hedişak ger di filman de baş bête amade kirin, her nîşana Cannes ye.

Ger mirov têkoşîna gelê Kurdi, ês û elemen wî, evîn û jîna wî, şerî pêşmerge, zahesten jîyanê di filman de berçav nexe, xelk û alemdê çawa fêr bibe. Ji ber vê yekê ci ji destê me were eme filmê Kurdi pêk bûn.

**- Wan bûyeren dawî û kuştînen ku li Ewrûpa dibin ci tesîre li te dikin?**

- Ma wê hîn ci tesîre li min bike.